Wiktionary

# Wîkîferheng:Kopîkirî/Pend û Peng, Bîlal Hesen

Tenê bot; Wext: 01/10/2020; Hejmar: 3219

1. a hewiya herikî a cawiya xeriqî
2. a xoce azan e
3. adar e, sibehê sar e, êvarê bihar e
4. adarê, agir çêtir e ji xwarina savarê
5. adarê, serê darê çêtir e ji binê darê
6. adarê, şev û roj xedarê
7. agir bi darên hûr tê geşkirin
8. agir bi loda min ket, xelkê xwe li ber germ kir
9. agir bi riyê yekî ketibû, ê din go
10. agir bi serî min ketî, tu jî firîkî xwe li ber dibrêjê
11. agir di kulvila de (qurmê darê) dimînît
12. agir kete mala derewîn derewîn gazîkir, kesî jê bawer nekir
13. agir xweşe, lê bi dûmanê reş e
14. agirê dilan, agirê sêlan
15. agirê evînê dilan dişewitînê
16. agirê kuçkan her germe, bi dereng sar dibe
17. agirê xurt di kutikê kevin de ye
18. ahînid meriyan ji meriya re namînin
19. alîk firn û alîk curn
20. alîkî darê rim jê dibê, alîkî xwe bêr jê dibê
21. alim bibe rê, di ser re derbas nebe
22. alim ji bîr dike, qelem ji bîr nake
23. anca caw di ber meqesê re bigînê
24. anca meqes di ber cêw re bigînê
25. anca nênûkid mera mera bixurînin
26. anca şor di dûyî miriya re bibin
27. anê bi'ukê, jinikê rihikê
28. aqil bata firotin minê hinekê ji kerê xwe re bikiriya
29. aqil bi xwe ji zirarê ye,
30. aqil derxistine firotinê, herkesî dîsa aqilê xwe kiriye
31. aqil di sêrî de bûye pelûl
32. aqil di seriyan de ye, ne di dirêjahiya çekan de ye
33. aqil ne benîşt e ku mera bi serî hevda bizemirînê
34. aqil ne ji biçûk û meziniyê ye
35. aqil sermiyan e, ne di serî hemiyan e
36. aqil tune kêf dike, pembo tune eşêf dike
37. aqilî heft jina di serî mirîşkikê de ye û hew mirîşka jî li ser sêrgo diçêre
38. aqilî kêm bi mera ga û golka bi çêrandin didê
39. aqilî kurmênc pişt nîvro tê sêri
40. aqilkêm xiraba dipên
41. aqilsivika bar giran in
42. ar bi dunyê kevê derziyeke min tê tine ye
43. ar bi mala yekî keti bû, yekî jî serpiyê xwe li ber dikizirandin
44. ar î bi min ketî dûman î ji te derê
45. ar î bi serî min ketî, ew î cixarê xwe pê vêdixe
46. ar î di kutkî kevn da ye
47. ar ji sîfîliyê hez nakê
48. aram stûnê jînê ye
49. araqi dan mişk, xwe li hember pisiyê vena
50. arê sergoya ye geh vêdikefê geh vedimirê
51. arê zengîna tim î germ e
52. arvanê salê, di salê de diçe
53. aş digerê bi bê qîz tê li dê
54. aş digere qeraş xwe dipesine
55. aş dike qeraş dixwe
56. aşekî bihêle ko tu arvanî xwe lêkî
57. aşî nezana bi xwe digerê
58. aşvan li ser ard qise neke, wê li ser çiwalan qise bike
59. av berê ya biçûka ye, nan ê mezina ye
60. av bi bêjingê nayê civandin
61. av çiqas di gola da ma, ewqas digemirê
62. av di gola de dimînê, jin di mala de dimînê
63. av di golan de genî dibe
64. av û ar amanê nizanin

65. av û ar ti car nabin yar
66. av û zibil bi zorê ji xwedê distînin
67. av xew dikê dujmin xew nakê
68. av zanê ko binav li kû ye
69. av, avahî ye
70. ava bi mista, ramûsnên ji dosta têrnakin kesa
71. ava bin kayê, deng jê nayê
72. ava binê ka yê, kî têkevê jê dernayê
73. ava ciyê teng, jê tê xuşxuş û deng
74. ava diherike, coka xwe çêdike
75. ava xorta berve jor dihilkişe
76. avahiya mala bi jina ye
77. avahiya malan di destê jinan de ye
78. avê aş biriye tu bi dû çeqçeqo ketiye
79. avê gi da ser te, çi bostek çi tiliyek
80. avê xorta bi dîwara da hildikşe
81. avên biçûk ên diherikin, ji yên sekinî û mezin çêtir in
82. awcî kes vê ra tine bê, forta pir dikin
83. awir zawir derê
84. axa kendalan dibe delaliya malan
85. axatî bi şorbê sar nabe
86. axe bibin ker têrrê xwe çemeke ser
87. axe ji êlê xeyidi ye, êlê hajê tine ye
88. axê jinê û mêr ne wek hev bin di hev nagerin
89. axe kirîf azarkir ji bo rûnê, xulam berî kirîf rûnişt
90. axe li xizana didin, xizan her tiştî xwe di ber wan da didin
91. axê mêr û jinê ne ji hevbê hevdi nabin
92. axe nên dide xulam xêli dibe
93. azep hene bi nanzikê ne
94. azepê mala xwe be, ne axê xelkê be
95. ba berî baranê tê, ta berî mirinê tê, ken berî girî tê
96. ba jî jê ye, baran jî jê ye
97. ba li bêderê te hat, li bake
98. ba li dîwarê derve dide
99. ba neyê pelçik naheje
100. ba sîtila dagirtî nêxîne
101. ba yê hina tê kayê li ber badikin, ba yê hinka tê zebeşa li ber badikin
102. baqilbûna pir belaye
103. baqir nabe zîv, her geyak jî na be şîv
104. bar bikevê ji xwediya pêve kes tine ye
105. baran dibare, ji xwediyê zeviyan re kare
106. baran ji rengê ewra de xuyaye
107. baran tê erd xwe dipesinê
108. barê bi aqila, li pişta bê aqila
109. barê giran para kerê ye
110. barê hicetan kes nikare rast bike
111. barê kerê tiving bin jî, dîsa gurê wê buxwin
112. barê ketiya kes bilind nake
113. barê te ket, zorê bi morê de
114. barê tu nikaribê rahêjê nekeve bin
115. barî kerê ne giran bê, ker nabezê
116. barût ji kîsî zêve ye
117. başaq li pey paleyên baş nayên berhevkirin
118. başî, başiyê nasdike
119. başiyê ji cîranê xwe re buwaze, ji bo tu jî başiyê bibînî
120. bav bibe zirbav, dê jî dibe dêmarî
121. bav çawa ye, kur wisa ye
122. bav dixwaze law jê çêtir be, xoce dixwazê şagirt jê jîrtir be
123. bav ji êş tê, law pirsa bajêr jê dikê
124. bav qoriq dixwin, lawa diran ditevizin
125. bavê baş kur sed salî bi navê wî nan dixwe
126. bavê ling hilanî, kur li şûnê danî
127. bavê te hat kuştin, çi siwara kuşt, çi peya kuşt
128. bavê xwe kuşti ye, nimêja xwe jî li ser kiri ye
129. bavê xwe kuştî, bi tirbê sûnd xwarî
130. bavek heft zarokan xwedî dike, heft zarok bavekî xwedî nakin
131. bawerî hêza jiyanê ye
132. baweriya xwe bi tiştekî neyne, li hember her tiştî bi tevdîr be
133. bawîşk, bawîşkê tîne, gulzêrîn di kadînê de linga dikutîne
134. bayê sibê li mirovan nexe, yê êvarê hêç e
135. bê haveyn şîr nameyê
136. bê hêvan şîr nabê mast
137. bê şêx û pîr neçe dîwana mîr
138. bêçiyê xwe di dengizê kê dengizê biherimê
139. beden bedena şirtê ye, law lawê çirtê ye
140. beden gep û zep e, aqil rast û çep e
141. bêdera me ar vêket

142. bêderê vê tene li ba meke
143. bedewî deh in, neh jê çek in
144. bedewî nayê veşartin
145. beg qedrê beg, şivan qedrê şivan zane
146. bêhna fereh ji bênamûsiyê ye
147. behr bi devî kûçka naherime
148. bêje rast, raze rast
149. bejin çît û kitan e, nan qizî qitrane
150. bejin tîte, lê mal rûte
151. bela dîna ji bela xwedê mezintir e
152. bela ji dera bêgûman tên
153. bela nezana ji bela zalima xiraptire
154. bela tên serî mêra
155. belên xelkê ji dûr de tên, ên me ji ber ûr de tên
156. bênamûsî avêtin ber kûçkan, kûçkan qebûl nekirin
157. benîştî te bila bi serî pozî te va bê, kengê te xwast bicû
158. beqa deng li mara kir, kêvcala lingê xwe li bakir
159. ber ji bestan xelas nabin
160. ber siya rovî romene, bera şêr te bixwin
161. bera berê heyvê li me bî, me çi ji stêrkayî
162. bera bizê, nêr û mê ferq nîne
163. beranê bisko ba, tu wê li ber derî yê babo ba,
164. berberî û nanî genimî nayên ba hev
165. berdanê jinê, adeta dinê
166. berê bifikire çêtir e
167. berê darê bi darê ve kurmî dibe
168. berê em di donê xwe de diqewiri
169. berê giran di ciyê xwe de girane, gava leqya ne bi du peran e
170. bere lawkê min lawîn be, bere kirasê wî cawîn be
171. bere qûna mera derkeve, bere dengê mera dernekeve
172. bere rûyê mero biêşê, çêtire zikê mero biêşê
173. berf çiyê dibînê, xwe lê datînê
174. berf jî sipiye, kûçik bi ser de mîzdikê
175. berf ketiye, mêrik kêrê tûjdikê
176. berf tê digrîn, derê li pê digrîn
177. berfa êvarê, qirê tîne li debarê
178. berfa hûr, xwe davê rana sitûr
179. berfê bixwe ji tîna bimir, daniya bixwe ji nêza bimir
180. bergîr digrin hev, ker li ortê pehna duxin
181. bergîra têr xwarin, ê zîta bavên
182. berî bigihî avê, daw û derlingid xwe hilmede navê
183. berî darê darê dixemilîne
184. berî dê ya tim berve lawane, berî lawan jî tim berve çiyane
185. berî giya zelaxît in, paşê qermeqît in
186. berî gotina xwe bêjî, gul xwe ne
187. berî ko îş bên serî te xwe biparêze
188. berî ku tu bighê êfrîn (çemê êfrîn ) xwe tazî meke
189. berîka feqîran vala ye, qelbê wan tijî ye
190. berîka rûta qul e
191. berjêr tifke rih in, berjor tifke simêl in
192. berû yê darekê ne, pîvazê mişarekê ne
193. berûk ji çiftê ket got
194. berx li berên tê
195. berxa xwedê xwedî bike gur nikare buxwe
196. berxê xelkê ji meriv re nabin beran
197. berxî çê di kozê da xuya dikê
198. berxî çê di ser kozê de bêlî ye
199. bext hebê, text ê bi xwe bê
200. bext kete xortekî bi dil bê, çiqasî pez bigerînî, pez şîr didê
201. bextê bedbexta tinebû, min mêrek kir ew jî exte bû
202. bextê sêwiya heba roja îdê zik nedêşan
203. bextê sêwiya heba, dê û bavê wan nedimirin
204. bextê te hebê, pisîka te jî wê nêçîrvan bê
205. bextî dotê ji dê ye
206. bextî min di her tiştî de reş e, tenê di zebeş de sipî ye
207. bi avê gemirî re tê vexwarin
208. bi avê û bi êgir mesqeri (lîzk) nabê
209. bi baqila kinca bişûn, bi dîna dawşînin
210. bi çavê xwe te nedît û bi guhê xwe nebihîst înan meke
211. bi çavgirtinê, çav teng nabe
212. bi çûkî bi goçê re dimeşî, mezin bû li kerê kirin
213. bi dandinê biçûya ser, jin ê bi mêrî xwe re biçûya ser
214. bi darka bi qulê sêmsora mekeve

215. bi dêna dên sax nabin
216. bi desta berda bi linga li dû gerya
217. bi destî xwe bike, bi devî buxwe
218. bi dilê mezinan bizewice, bi dilê biçûkan jî hezbike
219. bi dilî xwaşi mera dikane mêr ji qolê bikşîne
220. bi dîna hêvîr bistirê, bi baqila nên bike
221. bi dîna kinca bişo, bi baqila raxe
222. bi dîna re dîn, bi baqila re baqil be
223. bi dînan stiriyan biçine
224. bi dinê bişêwirin , dîsa bi ya xwe bikin
225. bi dînî kir, bi baqilî xwarî
226. bi dizî hat nêrî, aşkere za
227. bi du pera me tu şand, em nikanin te bi çel perî vegerînin
228. bi dûvmqesokekê bihar nayê
229. bi fenê dibe bin benê
230. bi gemarê ber dirana mera têr naxwe
231. bi gotina jinê, ket doşeka mirinê
232. bi gur be, pêşî kerê min buxwe
233. bi gur ra dixwe bi şivên ra lê digere
234. bi gur re dixwe, bi xudên re şînê digerîne
235. bi gurmistê mebeze dirêşê
236. bi heft ava bişû pak nabê
237. bi heft qatê erdê da çûye xwar û hîn jî li ber xwe nakevê
238. bi heft top kêndir girêde zepnabê
239. bi kê re bigrî, tê bi wî re herî heşerê
240. bi kêfçi kom kir, bi heskê bela kir
241. bi ketinrabûnê kabêd me qul bûne
242. bi kêvcêl ra gotin, çima berxar berxar dimeşî, got
243. bi kûçik re gotin, bibez û birew, got
244. bi kulîlkekê bihar nayê, lê kulîlk nîşana biharê ye
245. bi kulmê neçe ser dirêşê
246. bi lê (lehî) de çû û ji ê xwe namîne
247. bi lêda derê û ji xwe nagerê
248. bi lêda derê, dibê ezî avjeniyê dikim
249. bi malê dunyê nefire
250. bi mara emnet dibe, bi axan emnet nabe
251. bi merdan bipirse, ji pîsan bitirse
252. bi mirinê dilê xwe şa neke
253. bi mirîşkê re gotin, li ser sêrgo meçêre, go, xûya min e
254. bi mirovekî govend nabê, lê bi hev dikevê
255. bi nav keleka ket ( dest bi xirapiyê kir )
256. bi nermî mar ji qulê tên derxistin
257. bi pariyê xelkê zik têr nabe
258. bi porê sipî di xwîna sor da gevizî
259. bi qurişekî kûçik dixesînê, bi du qurişa destê xwe dişû
260. bi rovî ra gotin, me tu kir serekê mirîşka rovî go
261. bi sebrê qoriq dibe tiri
262. bi şev bûk e, bi roj pepûk e
263. bi tir fisa caw boye nabe
264. bi xatirê xatiran gelek diçin ser dînê kafiran
265. bi xêra seriya dixwe keriya
266. bi xulaman re bixebite, bi mîran re buxwe
267. bi xureka xelkê, qasik nakele
268. bi xurîna (xurandina) xelkê, xur danamire
269. bi xwarina gura be, ne biçûkê bira be
270. bi xwaziya kes nagrê gurzê keziya
271. bi xwe lîstî, bi xwede mîstî
272. bi zana re here dûjehê, bi nezana re mere buhuştê
273. bibe çûka newala, nebe mirîşka nav mala
274. bibe dostê rojên teng, bila ji te re jî dostê rojên teng çêbibin
275. bibe xulamê zana, nebe mîrê nezana
276. bibez, dibên aşiq e nerm here dibên çatiq e
277. bibîne cefê, têkefe sefê
278. biçûkê malê, dimînê delalê dê û bavê
279. bigre qedrê kal û pîran, çi feqîran çi mîran, ne li xweşiyê, ne li mirinê naçe ji bîran
280. bihar hat, rûmeta kincên zivistanê hilat
281. bihar keçek ciwan, havîn dayîkek, payîz jinebiyek, zivistan jî dêmariyek e
282. bihar, bihara ajal û hova ye, payîz, bihara mirova ye
283. biharê berf radibê pozî darê û namînê êvarê
284. biharê pez, payîzê rez
285. bihostek pexîlî, qulincek rezîlî
286. bike û neleze, neke û neleze
287. bila berî hêvê li min bê, bila xelk giş dijmin bê
288. bila bextê mirov hebe, bila çavek xwe nebe

289. bila bihur be bila kûr be, bila qîz be bila pîr be, bila rast be bila dûr be
290. bila bizê, nêr yan mê wek hev in
291. bila boxanê rojekê bim, ne çêleka salekê bim
292. bila bûk gêj bê, ne ziman dirêj bê
293. bila çavid meriya derkevin, bila navî meriya dernekevê
294. bila dîkê rojekê bim, ne mirîşka sed rojî bim
295. bila dil bi dil be, bila ser erdê hesîr be
296. bila dîn-îman li cî be, zewaciya evdalê min bi derengî be
297. bila ez di kulavê xwe de bim, ne di birca xelkê de bim
298. bila ez fiqarê gundê mezin bim, ne axê gundê çûçik bim
299. bila gûzek bê , bila ne fiç bê
300. bila hespî çêbe bila bê nal be
301. bila keç herin ser sêwiya, bila nerin ser hewiya
302. bila kur be, bila navê qîza lê be
303. bila mêr mêr be, bila jin kera çolê be
304. bila mera bi ser dara keve, û mera bi ser zara nekeve
305. bila mera dîkê salekê be, ne mirîşka deh salan be
306. bila mera gurê çiya bê, ne biçûkê bira bê
307. bila mera li ser dara be, û ne li ser zara be
308. bila merayî sêfil be, bila merayî ne erzan be
309. bila mirinê ga ji cê bê
310. bila mirov zirav û dirêj be, ne kin û stûr be
311. bila nan bi te bi şekirbê paşê buxe
312. bila navka mirov derê, navê mirov derneyê
313. bila pariyê te nîvci be, bila namûsa te li cih be
314. bila qîzê bibin ber xencerê, lê nebin ser xeberê
315. bila rû bêşe bila zik ne êşe
316. bila rû sipî bê, bila nan ji ceyê reş bê
317. bila rû yê mirov bêşê, zikê mirov nêşê
318. bila rû yê te xweş bê, bila nanê te reş bê
319. bila rûmet li ci bê, bila pari nîv ci bê
320. bila rûmet li cih bê, bila zik birçî bê
321. bila şarê ( şehrê ) pirrepirr be, bila zikî qurrequrr be
322. bila tu zanibî ku dew birê mêst e
323. bila xoristan be, bila ne goristan be
324. bila xwedê yar be, bila dinya hemî neyar be
325. bila xwîndarbim ne dêndarbim
326. bilbil bi dengê xwe, mêrxas bi cengê xwe
327. bilbil hevalê gulê ye
328. bilbil xistine qefesa zêrîn, gotiye
329. bilind firî, li rêxa buharê şimitî
330. bilind firya nizim ket, nizim firya bilind ket
331. bilind nenêre nizim nekeve
332. bilûra li ber ga ye, çira li ber kora ye
333. bimîn bibîn li dunya yê, bixwe vexe tim ew e
334. bimîn û bibîn
335. binalê nenalê tê koxê bimalê
336. bînê dermên ji te neyê, kes ji te natirsê
337. bîne ji mezina û bide mal mezina
338. bipirse, metirse
339. bîr bi derzîkî nahête kolan
340. bîra avê jê vexwê kevra navêjê
341. bira bêjin ker e, nebêjin kerr e
342. bira biratî ye, bazar beyantî ye
343. bira dilê meriv xweş be, bira balgiyê bin serê meriv jî kevir be
344. bira girar bol be, bila kevçî qol be
345. birawo berdero, derdê kezebê da sero
346. birçîbûn sofîtiyê nahêle
347. birçiya nan xeyal e
348. birê ji birê hez kira, jinê birê ne dibir
349. bîrê me avdar e, xortî me sazdar e, dengbêjî me navdar e
350. birîn saxdibe, şûnê xuyadibe
351. birîna li hogira, bîna ( mîna ) derba li kevira
352. birîna vekirî mirov xweyê naxê yê
353. birîna xebera ji birîna şûr kûrtir e
354. birîna ziman ji birîna xiştikê kûrtir e
355. birinca îro ji goştê siba çêtir e
356. birîndar radizê, birçî ranazê
357. birînê şora kûrtire ji birînê şûra
358. biroş digerê qapaxê dibînê
359. biroşê got, binî min zêr e, heskê got
360. biroşê ko parê min tê da nebê zêhêr têda bê
361. bişkovid qul bi etara re namînin
362. bitirse ji germa germ û mirovê nerm
363. bitirse ji segê har, û ji jina bi yar

364. bitirse ji xwedênetirsan
365. bizin bimire jî dûvê xwe berjêr nake
366. bizin çû, şujiyê da dû
367. bizin difkirê bi halê xwe, şivan dikeve xema beza xwe
368. bizin jî ya me ye, kizin jî yê me ne
369. bizina belek, şivanê kulek, êvarê bi hev re dibin yek
370. bizina ku tu çiçka nemêjînî , şîr bernadin
371. bizinê ji pêz veqete para gur e
372. bizinê ling hilanî, karê ling li şûnê danî
373. bizna hemis, lê mepirs
374. bizna kol hobû daniya
375. bizna şîrdayî û lingê xwe li biroşê dayî
376. biznê gurrî li serî kaniyê avê vedixe
377. biznê hişk didoşê, pez tine ye rûn difroşê
378. biznê malxwer, dêv davê her tiştekî
379. biznek gurrî navî kerîkî xiradikê
380. bo baqila gotinek jî bese
381. bodela ( bûdela )got, baqila înan kir
382. bostek miqrisbûn, gazek rezîlbûn
383. bû doşeka meydana
384. bû kûçkê hêkêd pîrê di pînkê da xwarine newêrê werê mal
385. bû tirra di golê da
386. bû ye masiyê ku av li ser hişkbû ye
387. buhar têre li paş kerê mere
388. bûk bê tac dibê, bê benîşt nabê
389. bûk bi dilê zavê ye, çi karê gundî û cîranan pê ye
390. bûk di kincî sor de, qiçik di ber şîr de
391. bûk di sorik de, zaro di lorik de
392. bûk jî ji me ye, tûtik jî ji me ye
393. bûk li ser hêspe, hefsar di deste, kes nizane ji bo kê qismete
394. bûk stewre, qîz avise
395. bûk tasa zêrînî bîne, wê bi xwe tê de nan bixwe
396. bûka bê şerm û heya, siwara dike peya
397. bûka bi def mîna rûnê bi kef û bûka revandî mîna rûnê helandî
398. bûka li ser hespê kes nizane nesîbê kê
399. bûka nuh hat hêka hesinî kir
400. bûka rind di sorkê de bêliy e
401. bûka yekê bi apê re dibê
402. bûkê di reşiyê ke pîrê di xweşiyê ke
403. bûkê rind desmalê ser desta ye
404. bûkê tir kir, bûk xeyidî
405. bulxur kişî bi legana, tiştek neket nav dirana
406. bûn wek nohoka li tehtê ketî
407. bûne gurê mûsa, xwe bi xwe bi canî hev ketine
408. buxwe weke mêran, rabe weke şêran
409. buxwe, pê bidebir, ne buxwe pê bimir
410. bûye benkê dû hebanê
411. bûye dînê dindoq diye
412. bûye gawirê pîsî bi xasiya xwe kirî
413. bûye kerê di aşê qabê de carekê ceh xwariye, heroj derê û tê
414. bûye kirîfê pêl koz naye
415. bûye korê kêç bi des ketî
416. bûye kûçkî bi ewra da direwê
417. bûye kuriyê bûtê, şeş mehîbû çiwalek genim radikir, yeksalî bû nikarî nîv çiwal rakira
418. bûye kurriya mala hisê abo, tim li aşê qabê mistek ceh xwarî
419. bûye marê bin teştê
420. bûye marî axû li serî ketî
421. bûye mirîşk, û xwe vedipişkîne
422. bûye miya gur xwe di sera çekirî
423. bûye pisiya bi mişk dilîzê
424. bûye yê ku ker li bavê xwe pix kirî
425. bûyi pisiya ku li ber mişk dahatî
426. camêr bi destê bêbexta dimirin
427. camêra tu di ber re wîne, î xerab tu jê bixwaze
428. can dere, teb'et nare
429. can îmdatê dixwaze
430. can şêrîn e
431. carê werne ber caran, kerî reş ê bi xwe bizire û were ber baran
432. carekê li nêl dixe, û carekê li mêx dixe
433. carekê tiştek li gurdî ket, zû dûzan nabê
434. carekê xatir, carê din xatir, carê sisi yê çatir- patir
435. carikê pêtka dîk di teştê da dît
436. carina kevrî mera pê qayil nabe serî mera dişkîne
437. carina rev ji desthilanînê çêtir e
438. carina rev jî mêrani ye

439. carina şîretên herî baş ji mirovên herî xirap derdikevin
440. caw cawê te ye, meqes meqesa te ye
441. cawê bi kutan bê dewê bi derman bê
442. cawê bi kutan bê, şaşiyê li serî mêra bê destê bi destî jina bê
443. ceh kera şamî dike, xizanî mêra ketî dike
444. ceh rşandiye, genim naçine
445. cehşik mezin be jî dîsa kere
446. cerrî nuh, avê hênik dike
447. cersandin lê fetsandin
448. cewdikî xwe di nav kuna de dîdine
449. cewrên seyê dir timî dir in
450. cifût deyndar· bûn, defterêd kevn vedikin
451. cih heye ko xebernedan ji xeberdanê çêtir e
452. cih heye rev ji mêraniyê çêtir e
453. cihê bilind, ji mirovê nizim çêtir e
454. cihê pakî hebe, xerabî çiye
455. cila bi malê gerek be, li mizgeftê herame
456. cila ko ji mala te re gereke, bi ber camiyê veneke
457. cilhecî, li hember terzî bihecî
458. cin bûkên xwe li kûçkêd reş sîwar dikin
459. cîran bi her tiştî motacî hev dibin
460. cîran warisê cîranê xwe ye
461. cîranê baş ji birayê nebaş çêtir e
462. cîranê mera bi xêrekê be, mera bi heft xêra ye
463. cîranê xerab bihêle, diranê êşyayî bikşîne
464. cîranî muxenet mera bi hacet dike
465. cîranî pîs mera xwedan tişt dike
466. cîrantiya salekê, çêrêbûna bi salan
467. ciyê gorna miriyê te lê nebin ne warê te ye
468. ciyê ku agir lê tinebe, dû lê hilnakşe
469. ciyê ku rovî te lê girêdin û mişk te berdin ji xwe re meke war
470. ciyê lingê xwe bike, paşê gava xwe çeke
471. ciyê şera ortê gund e
472. ciyê tu nih deriyê ez jê têm
473. ciyê xiya werê qelawîza naxwazê
474. coka bîstana, nabe ji bo aşvana
475. coko lawo rabe bileqitînehavînê bibhorê kar namîne
476. cota bira neçin gura
477. cotkaro tu çi di çînî ger şîn bê tê bibînî
478. ça têne pa lê jin nêne pan
479. çalima li xelkê nemîne
480. çar tişt hene serhişk mirîşk û mişk mar û dûpişk
481. çare çele, sî-û-neh bi êqilin, yek bi çov e
482. çare li her tiştî dibê, li dil û mirinê nabê
483. çav bi çava dikevin belê çiya bi çiya na kevin
484. çav dujminî xwe nasdikê
485. çav ji çava şerm dike, bertîl kevira nerm dike
486. çav li gêrmiyê kir xwe ji bîrkir
487. çav zer hebin, simêl reş pirin
488. çava pit-pit dukutê û dengî xwe nakê
489. çavê derîgirtiya li ê derîvekiriya ye
490. çavê kêrî neyê, tilya xwe li bin bide û derîne
491. çavê kor tune, lê bextê kor hey e
492. çavê ku li deriyê xelkê be, timî birçî ye
493. çavê zaretê zerin
494. çavêd li rêyê te mila kor bibin
495. çavek korbû, çavê din ne xeme
496. çavên birçî ti carî têr nabin
497. çavên xwe damirandin devê xwe vekir
498. çavên zer di nav ka yê de dît in
499. çavid mela çarin gi ne heyşt bin
500. çavzerê te hebin, çavreşê xelkê pir in
501. çawîr rabû bi bosta, şagirta da ser hosta
502. çaxa cwanbûm, bi tîr û kevanbûm, lê çaxa pîr bûm bi kul û hesretbûm
503. çaxê qufirê derbaz bû, di kokê kîrî xwe bide
504. çê kir ji xwe re, xerab kir ji xwe re
505. çek ne ji bo hemiya, lê nefs a giya
506. çêlemar bê zihêr nabin, mêrêd çê bê yar nabin
507. çêlkê qirkê mezin bûn, risqê qirkê qut bû
508. çêlkên mara bê axû nabin
509. çêlmar jî bê jehr nabin
510. çem bê bihur nabin
511. çem ji kaniyan çêdibe
512. çend çiya hene yê kurdan e
513. çeqel û rovî nakevin yataqê şêra
514. çêre çiqas nerm bibe di bin kevirda nasekine
515. çêrrê kûçka bibe, û ço dîne ba xwe
516. çêyî kir bi xwe kir, xirapî kir bi xwe kir

517. çi bê serî mera ji zimên e
518. çi bi etêr ra bê, bi wî ban dikê
519. çi bi reng e, kanê heft şîva di biroşekê da bikê, û yek bi yekê de venedê
520. çi bi serî mera werê ji dev û zimanî mera ye
521. çi hat aqilê te neke
522. çi hat meydanê, emê çekin hebanê, (mebest emê bixwin)
523. çi keçel hesen çi hesen keçel
524. çi rojê baran bê, ew roj wê zivistabê
525. çi serî ye, çi merî ye
526. çi werê serî te, ji des zimanî te ye
527. çih zindiya xwarî, mayî dora miriya
528. çil ( çel ) tajî yên te nikarin xirnikekî (çêlkê kêrguh) min rakin
529. çiqa mirîşk tawli dibê, weqa kûn teng dibê
530. çiqas av kûrdibê, weqas avjenî xwaşdibê
531. çiqas çiya bilind bê mij wî winda dikê
532. çiqas kaş hene weqas deberjêr jî hene
533. çiqas pêde, nankor e
534. çiqas pîsiyê tevde, hewqas bîn dide
535. çiqas sax bimînî, ewqas ecêba dibînî
536. çiqas sing bikut tu weqas cihêr pêvedikê
537. çiqas sing bikut, ê weqas tûr pêvekê
538. çiqas tu bilind bibê, ketinê pîsbibê
539. çiqas tu kûçik kevirkê, ê weqas bi hewt hewtkê
540. çiqas tu kûçka kevirkê wê weqas birewin
541. çiqas tu zanabê ji zana pirske
542. çiqas xwediyê te pîsbin pêl wan meke
543. çiqasî hevalên te pir bin hindik e, dijminê te yek be pir e
544. çiqasî şareza ye, weqasî şerpeza ye
545. çira ji kora re def ji krra re bê fêde ye ( bê sode )
546. çirîskek di taryê de rokeke di ronyê de
547. çîroka bizê ( biznê )li xweşiya pîrê nayê
548. çiva mede xwe çiv ne rindin
549. çiya bi (di) ser hev re hene
550. çiya çiqas bilind bin, illem rê vêdikevin
551. çiya rastî çiya natên lê mirov rastî mirova tên
552. çiyayê bilind, bê dar nabe, keça gihîştî, bê yar nabe
553. çiyayê codî ji weynên jinan xwarbû ye
554. çiyayên bilind bê mij nabin, newalên kûr bê av nabin
555. çiyê gotî
556. çol fere ye, tir bi pere ye
557. çor ket ga, rîk ket sa
558. çu evrazî bê jordanî nînin
559. çû heckir, dînê xwe li ser kir
560. çû heckir, vegerî gûza
561. çû heckir, xwe ji berê xirabtir kir
562. çû mala derwêşa, jêre danîn mastê gamêşa
563. çûçik çiqasî bifire, gava avê vedixwe li xwedê dinêre
564. çûçik li ser garisên feqîran datînin
565. çûçik wê li çolê bi hevgirin, û di nav garisê me de wê li hev werin
566. çûk ê li nav garisî axa şer bikin, wê werin li nav garisî fuqara li hev werin
567. çûka wîçwîç danî, tu bi tiştekî nizanî te mala xwe xera kir û mala me li ser danî
568. çûkek xwe çedikê paş hejekî xelas dibê
569. çûkmezinî mara tine ye
570. çûme şikefteka tarî, tijî tê de gopal in, yekî wisa nebû destê xwe bigrim
571. dahol jî ya wane, û gopal jî yê wan e
572. damarêd meriyan di erdê de nînin ku bi axê bijîn
573. dandinê ji dil di dayînî destan re xiya ye
574. danê kûn, bi ser de lepek rûn
575. danû xistin dawa wî kîrê wî rabû
576. dar bi berî xwe şîrîne
577. dar bi pelkê xwe dike hijehij
578. dar ji ziravî dişkên, mirov ji stûrî dişkên
579. dar tineye ku bê lê ne xistî
580. dar û kulavê min, rehme li dê û bavê min
581. dara azadiyê bi xwînê tê avdan
582. dara bê pel û ber, kes kevirnakê
583. dara ko tu bi xwînê avnedê, berê şêrîn nade
584. dara ku jê duxî, lê miqate be
585. dara mer dayî, çiqil dayî
586. dara sêv pêve, kevirê herinê ji virve wêve
587. dara te bi ber bê, wê silav li te bê
588. dara xwezi yê ti car şîn nabe
589. dara zulmê zû qalind dibe zû jî dişkê
590. darê xoxê ne tu dar e, jinê bi mêr ne tu yar e

591. darekî têxê qunê, gulekê dide ber bêhnê
592. darên sert zû dişkên
593. darkê nav her pelûlikê ye
594. dasek bi dehlekê nikane
595. dawet a duduyan, cenge cola hemûyan
596. dawet tune li kefçiyan digere
597. daweta mîra gir e li feqîra
598. dawiya pevçûnê dijmaniye, dawiya dijmaniyê poşmaniye
599. daxbe li destê saxbe
600. daxê qurfê, kerê mirtiba dimre
601. daxwaza koran, du çavên reş in
602. dayê belayê, xuşkê tehlayê, jinê were kolana minê, ez te bigerînim li welatê dinya yê
603. dayê buhbikê, jinê rihikê
604. dê bibin jin bav, bav jî dibin zirbav
605. dê tev bavê cotek bask e
606. dê û bav berî li zaroya, zaro berî li çiya
607. dedo didizê, medo sûnd dixwê
608. dêkê diza du tirra dikê yek ji kêfa re yek ji tirsa re
609. dêla sor tê teleb, kûçik tê ji heleb
610. dêlik bi seh bê segê werê ji helebê
611. delîlê baranê baye, delîlê mirinê ta ye
612. dêlka mantore, kûçikê har jê nakevin
613. dêlka tirrek, jî dikeve tûla dirrek
614. dêlkê çilek kûçkî gurêx jê dikeve
615. dem bi te re neçû tu bi demê ra here
616. dem tê mera bi yarê dêya xwe re dixwe
617. dema bextewerî nebe dost, feyde nake gera bost bi bost
618. dema dayîk dimire bav dibe mam
619. dema hirç pîr bû kudik bi gunkan dilîzin
620. dema ji savarê re me digot
621. dema ker bikeve heriyê, ji xwedî zeximtir kes tune
622. dema ku ga dikeve, kêr lê pir dibin
623. demê ecil tê li derî naxê
624. dên bi danê, dijmin bi kuştinê
625. deng li dêng vedigere
626. dengbêj gula govendan e
627. dengbêj ku dest danî ber guhê xwe gereke zanibe bi kîjan kulamêde
628. dengê def û zirnê gumegum e, serî xort û keça bi şaş û kum e
629. dengê defê kiriye, lê nizanê li kîjan aliye
630. dengê ezmana nîşana barana
631. dengî dîk narê yê
632. dengî kerê bi kerê xweş tê
633. dengî xwe bilind meke, dîwar bi guh in
634. dengke tu dicerisê, deng meke tu dikerisê
635. derba ko nan dibire, şûr nabire
636. derbê neyaran xedarin
637. derd çiqas hene, weqas derman jî hene
638. derd derda tîne
639. derd di ser derdan ra hene
640. derd heye derman jî heye
641. derd pirin, lê giş ne li ba hevin
642. derd û kul ji bin hev derketin
643. derd û kulê me ne besbûn, derdê te jî bi ser de
644. derdê beko pelûl e
645. derdê feqîra nan e, derdê axa kêf û dîlan e
646. derdê hewiyê pir giran e, derdekî bê derman e, ya ku bi sêri nehatibê nizane
647. derdê hewiyê, jana tiliyê
648. derdê jina ku seriyê xwe li ser du balgiya diye nayê kişandin
649. derdevan pirbêjin, evîndar dengbêjin
650. derdî te ne ji bena dibê, ne jî ji werîsa
651. derdî tunebûnê çetine
652. derê ar lê nîştî, dişewitê
653. derê derba xencera, narê derba xebera
654. derê maşe lê, destî xwe meşewtîne
655. derê mî lê tu nebin, bizin ebdilkerîm axa ye
656. derew sêwî ye
657. derewan meke, ger te kir jî bira cefî te bike
658. derî bişkêne ku dar pir bin
659. derî kilîto, nav gund cirîto
660. deri yê xerata ( textbirr ) bi bena girêdayî ye
661. deriyê gomê vebe berx ber bi mêşinê, kar ber bi bizinê dere
662. deriyê necaran timî ji hev xelîne
663. deriyê xwe bigre û darekî di paşxe, cînarên xwe diz dermexe
664. deriyî necara her şikestî ye
665. deriyî xwe veneke, gazina li cînara neke
666. dermanê her tiştî xwedê ye, dermanê xwedê tine ye
667. dervayî min xelkê dişewtînê, hundirî min min dişewitînê

668. derwêş dizane çi di hebana derwêş de heye
669. derwêş zanê, çi xistî hebanê
670. derya bi çelpandinê devî kûçkekî nalewite
671. deryê xwe bigire, cîranê xwe diz dernexe
672. derziya xwe di serê xwe re kir
673. derziyê xelkê dibînê, şûjinê xwe nabînê
674. dest desta dişo, qencî rûya dişo
675. dest dizanê kuderê dixurê
676. dest hevdu dişûn û vedigerin rûya dişûn
677. dest hilanîn fereca xêrê ye
678. dest li desta heta ezmanê hefta
679. dest naghînê yê dibê
680. destê ramûsandinê, nayê gezkirin
681. destê rûs (rût) nedane ser zikê birsî ( birçî )
682. destê te bi don bê, di serî xwe bide
683. destê te ne destê mêrkuja ye
684. destê wî rast naçe paxila wî
685. destên camêran dirêjin ,( ango yê ko li mala xwe camêr be li mala xelkê jî bi serbestî dixwe )
686. destî camêra natê girtin
687. destî ku tu nikaribê kezkê, maçke
688. destî mera ne mizîn e
689. destî westayî, li ser zikê têr e, destê vehesiyayî li ser zikê birçî ye
690. destî xwarinê dirêj e
691. destî xwe mexe her qulekê, qul hene mişk tê da ne qul hene mar tê da ne
692. destikî bivir ne ji darê be dar nakeve
693. destikî pêlte ne ji darê ba dra nediket
694. dev dibê, guh nabîsê
695. dev î beş e zik î reş e
696. dev ji dêv namîne
697. devê girtî, kes nizanê çi tê de veşartî
698. devê girtî, serî rehetî
699. devê ku pîvazê nexwe, bên jê nayê
700. deve li xeyalekê û deveçî li xeyalekê
701. devê xwe hûmeke virra, qûna xwe hûmeke tirra
702. devgirtin vehesiya sêrî ye
703. devî hebe wê bibe dar, xwelî li serê bêwar
704. devî te tije xwîn bê, li ba kesî tif neke
705. devî te tiji xwîn bê, li ber dijmin velû meke
706. devî xelkê ne kûna mera ye, ku mera li ser rûnê
707. devî zû dibe dar, xulî li serî merî bê war
708. dew bi namûs e
709. dew birayê mêste
710. dew ê bi derman bê, caw ê bi kutan bê, şaşiyê li serî mêra bê, dest ê bi destî jina bê
711. dew li aşiqa nayê
712. dewar sol dikirin, jûjî got
713. dewarê baş alîka xwe zêde dike
714. dewat bi xudana şên dibin
715. dewî ceribandî çêtir e ji mastî ne ceribandî
716. dewî mera ji mastî xelkê çêtir e
717. dewî tirş li bavê xwe nahêvşînê
718. dewlet sê cara tê ber derî mera
719. dewleta bi lez, rez û pez
720. dewran tim bi dor e,geh li jêr e, geh li jor e
721. dewsa şêran, rovî nikarin bikin gêran
722. dewsa şûran rehet dibe, dewsa gotina rehet nabe
723. dêya kabciya du tira dike, yekê ji kêfa çîft re, yekê ji tirsa zirt re
724. deynakê, ku deynkir dibê hêştir
725. deyndar xwe avêtiye pişt xwîndar
726. dezîkî jê bikşîne hezar perspan wê jê bikevê
727. di ber dîwarî çirûk re mere
728. di civatekê da çêrê marekî bibe, di wê civatê de çêl çêrok mara wê werê hewaldan
729. di destekî de ar e, di destekî de pûşe ye
730. di halan talana da kes nizanê kî kî ye
731. di havînê de rez û pez, di zivistanê de agir û ez
732. di kulavî şil da nasekinê
733. di mistê ke di fistê ke
734. di nav çewalek ka de li derziyê digerê
735. di navberê mêraniyê û qelsemêriyê de mûk e
736. di pê bandevê (barana xurt) re tim ga di axira ke
737. di qulê mazî da veşêre ê bibînê
738. dibê deve çima stûyê te xwar e, dibê çiyê min li kar e
739. dibê dewlemendo pîroz be, dibê feqîro te ji ku anî
740. dibê ez xadim im, tu dibê çend zarokê te hene

741. dibê kûsî tu çima pîsî, dibê li eniya min nîvîsî
742. dibê te dinya çawa dî, dibê li gorî dilê xwe
743. difirrî per pê ve nîne, darît pê pê ve nîne
744. digerî li dewleta lez, xweyîke rez û pez
745. digurije, nabare
746. dijmin bibe nan jî meke paşilê xwe
747. dijmin mezelê meriyan vedide, dost meriyan vedişêre
748. dijminê bi fam , ji dostê bê fam çêtir e
749. dijminê mêrxasa, di nav ûçikê jina dene
750. dijminê te bû herî, pêlê meke
751. dijminê xwe bi hesîdê kuşt
752. dijminî dujmin doste, dostî dujmin dujmine
753. dijminî merayî tewr mezin jinê mera ye
754. dijminî te gêrekek bê jî, xwe jê biparêze
755. dijminî zane ji dostî nezan çêtir e
756. dîkê dewletiyan jî hêkê dike
757. dîkê rojekê be, ne mirîşka salekê be
758. dîkî çê di hêlînê da qî dikê
759. dil dixwazê lê rû fedî dikê
760. dil dixwazê, lê laşe ranabê
761. dil fereh bê, rê fere ye
762. dil ko neşewitê, hêstir ji çava naşemitê
763. dil neke jina bi mêr, diçe mal dike ji bîr
764. dil timî can e
765. dîlan çawa digere, tu jî wilo digerî
766. dilê bi xezeb naghêjê mirada ( daxwaz )
767. dilê fereh pîr nabe
768. dilê mêvên ji mêvên tenge, dilê xwediyê malê ji herdiya tenge
769. dilê navbêjciyan firehe
770. dilê xerîba tim bi xem e
771. dilê xezeb mirov naghijîne mexsed û mirada
772. dilekî sadiq û yekî minafiq
773. dilêr bi destî bêbextan têne kuştin
774. dilî kûçka jî gêrmiyê rizê dixwaze
775. dilî kûçka jî hevrîşkê dixwazê
776. dilî şivên bixwazê, wê têlme ji nêrî bikê
777. dilketin xwaş e bi xortaniyê, zozan xwaş e bi goçeberiyê
778. dilketin, meryan kor dike
779. dilop bi xwe tirbê xwe dikolê
780. dîn bi lê da çû, dêv benîşt cû
781. dîn dîndûq dî, bûkê sindûq dî
782. dîn î dikene çê nabe dînî digrî çêdibe
783. dîn şerma dikin xwedî fedî dikin
784. dîn, ya li şahiya ye ya li şîna ye
785. dînak a bi çav a, bûnek a bi dil a
786. dînan tê meke û ehmaqan bi şopê mekeve
787. dîndar bin, maldar bin
788. dinê ji qencan vala nabê
789. dînê ku nanê xwe bi mûja bixwe ne dîne
790. dinê nêrdewane, hink têre hildikşin, hinek têre dadikevin
791. dînî tazî giş nas dikin
792. dînî tazî giş nasdikin dînî bi kinc tu kanibê naskê
793. dînok di şîn û şahiyan de kifş dibe
794. dinya bît dost, dijmin nabît dost
795. dinya dem e, gav petêx e gav lem e
796. dinya xan e, bazirgan bar dike û xan dimîne li şûnê wane
797. diran bi êş, derman kêş
798. dirêj nezane kinik ê awane orte-qalib baş-bîlane melhema dilan e dermanê derd û kulan e
799. direw (derew) li biyaniyê, pesin li pîriyê
800. dîtina çavan qinyata dila ne
801. dîwana keremirov têde nebin, bê xêre
802. dîwar ê hilweşê, toz ê hilkişê
803. dîwarê li ser cemedê ye
804. dîwarê xilxilî xwe jê bide alî
805. dîwaro min ji te re got, bûkê tu guhê xwe bidê yê
806. dixwazê du çûka bi kevrekî bikuje
807. dixwazê hêştir bi ûskê avdê
808. diya zavê lotika hildidê, diya bûkê navika (navkutka) hildidê
809. diyarî qesp in, şûn diyarî hesp in
810. diz diz e, çi hêkek çi gamêşek
811. diz ji malê bê, ga û golik di derî re derdikevin
812. diz li bazarê li hevketî digerin
813. diz li şevên reş digere
814. diz malid padişa jî vedikin
815. diz xumal e, dergeh-girtinî betal e
816. dizê malê ji malê be ga di kulekê re derdikeve
817. dizê nehate girtin şêr e
818. dizê neyê girtin, sultan e ( qerale )
819. dizî ji qûçekî, qehpîtî ji ramûsanekî

820. dizid havînê payîzê bêlî dibin
821. dohn di serî qirkê da tineyi
822. dolaba hebîbê necar, xewke wek hercar, şev yek e dergeh hezar
823. don nekî çirê çire rohnî nade
824. dorê bide dornasan
825. dost bi qentara, hesab bi misqala
826. dost di roja teng de bêlî dibin
827. dost malê xwe nadin mera, lê riya dirist raberî mera dikin
828. dost ne dostêd dewata ne, dost dostêd ber derî hepsa ne
829. dost pîs bê, dijmin ne gerek e
830. dost wek tebin dujmin ne gerek in
831. dostê te hingiv bê jî gişî malêse
832. dostî şahiya ne dost e, dostî tengasiya dost e
833. dostî wek te mila gur bixwin
834. dot û firot negîşte xeta cot
835. du aqil nakevin serîkî
836. dû bi ser rinda de derê
837. du gayê yekî hebûn, yek bi zorê dikirin koxê yek bi zorê ji koxê derdixistin
838. du hêka li hevxe wê yek bişkê
839. du mar di qulekê de dibin, du mal di malekê de nabin
840. du miraza bighîne hev, bi hecekê ye
841. du mişk bi hev re ji qulekê derketin, yekî ji yê dî re got
842. du parên xizani yê, nezani ye
843. du peya ji malekê narin dewatekê
844. du seriyê mezin di biroşekê de nakelin
845. du seriyê ne wekhev, naçin ser balgîkî tev
846. du textik û bizmarek
847. dudiyan got kumî te ne li serî te ye, dêst bavêjê
848. dudu por dirêj ji yekî ser filûs şê dixwazin
849. duh ji hêkê derketî, îro dîkaniyê dike
850. dûma her tiştî heye, dûma zilmê tune ye
851. dunya bi sebrê çê bûye
852. dunya bi serî mirî de xira dibê
853. dunya bi tirra bata kirrîn, kera wê bikiriya
854. dunya bi umidî ye
855. dunya çû bi ser nîvro ve, hîn golik bê av e
856. dunya derewên e, ji kesî re namîne
857. dunya dûvê berên e kê pê zanî li ber wîn e
858. dunya ji şêx û feqiya de xiradibê
859. dunya kê dot kê kirrî û firot
860. dunya lêhatin e, ne jêhatin e
861. dunya li serî merî gidî teng e
862. dunya qenc e ji şêra re, xweş milk e ji mêra re, ava bûye ji xêrê re
863. dunya sersiya dara ye, ge li vira ye ge li wira ye
864. dunya wê bi rez bê, dimis wê bi derman bê
865. dunya xan e û man e, hin çûne û hin mane, ê mayî jî mêvan e
866. dunya xane, mirov bazirgane
867. dunya xeyar e, ya bi te ra ye, ya di te ra ye
868. dûpişk bi yekî vedê, nalikê germ bikin û bi ser din
869. dûr bigere bi saxbêrî vegere
870. dûv tê de dikutê
871. dûvê kerê ye, dilivê lê hilnabê
872. dûvê kûçik heft salan kirin qêlib ku rastbikin hîn movkek ket ser
873. dûvî dinê dûvekî dirêj e
874. dûvî mişk di malê da bi ard nabê
875. dûvî xwe di tepka de ruqiçandi ye
876. ê bi birîn xewkir, ê birçî xwe nekir
877. ê bin sekinî, ê ser ne sekinî
878. ê birçî çû civatê, ê tazî neçû yê
879. ê birçî çû dawetê, ê tazi li mal ma
880. ê çê di me nagere, ê xerab ji me nagere
881. ê çê me nabîne, ê xerab jî ji me namîne
882. ê destê wî bilind e, serê wî bilind e
883. ê devê wî bi şîr şewitî bê, pif dêw dikê
884. ê diziya hingiv bike wê mêş pêvedin
885. ê ewîlêd xwe hene bila loma li gidiya nekin û id qîzid xwe hene bila loma li reviya nekenin
886. ê giya li gazê, ê te li boxazê
887. ê havînê serê wî keliya, zivistanê qaska wî dikele
888. ê ji derve hatî yê hindur derkir
889. ê ji şîr tirsî, pife dêw dike
890. ê jina xwe berde, li çogên sipî napirse
891. ê jinê berde li pani yê nanêre
892. ê ko deva xwedî bike deryê xwe bilind dike
893. ê ko deveyan bikire divê serdara xaniyê xwe bilind bike
894. ê ko dipirse ditirse
895. ê ko gelaciya li ba te bikê, wê gelaciya te jî li ba xelkê bikê

896. ê ko here nêçîra masiya wê qûna wî şil bibe
897. ê ko li dawiyê bikenê rast e
898. ê ko sifra bavê xwe nedîbê lome lê nabin
899. ê ku bi şora jinê be, wê li sira mirinê be
900. ê ku guh bide şora jinê, wê bibihîze xebera mirinê
901. ê ku mir, çavreş dibe
902. ê kurmi bi ê kêl kenî
903. ê kuspê dikute bi du qurşa ye, ê ko jê re ha ho dike bi çar qurşa ye
904. ê lê gerî, tê gerî
905. ê li hespê xelkê peyaye
906. ê ma li benda salê, wê li benda mehê jî bimînê
907. ê mera riswa dike ziman e, ê mera distrîne ziman e
908. ê ne li mala mera, nizanê rewşa mera
909. ê pê zanî kuftak xwe hilanî, ê pê nizanî kufta des xwe danî
910. ê rind vê yar-dost nabin, ê pîs jî vê derd-kul nabin
911. ê sebirî debirî
912. ê vî ne bigre, ne berde (pê bawerî nabe)
913. ê zimanê xwe kurt, ciyê xwe girt
914. ebemil giş mêr bana, sersipî giş jin bana, dinê xera dibû
915. ege riyê lawê te derketin, tê riyê xwe berdî
916. eger hinek mirov ker nebin, wê qîmeta kera zêde bûna
917. eger mera guh bide xelkê, mera wê rêkê mala xwe şaş bike
918. eger mera li ber avê çû, mera destê xwe davêje kevzê
919. eger mirî melûn nebît, qebir lê teng nabît
920. eger ortaqî rind bûya, wê du mêr bi jinekê bûna
921. eger te xuliyek li serê xwe kir, qe nebe bila alîyekî porê te biqijile
922. eger tirî pir bû, li cem rûvî dibe qoriq
923. eger tu çûyî ciyê biyanî xwe hebis bike wekî şêrê kavilan
924. eger tu kê xwe bighînê dijminê xwe, ji destê wî re tu xwe nêzîk bike
925. eger xêr bê welatekî, wê bighêje hemî cihê welat
926. êgir li ser piştê dade li xwe nanê
927. êl yaman e lê beg yaman e
928. elo, birin li qazoqxin, jinê got ê
929. em dixwin nanê sêlê, mêrik dixwe nanê êlê
930. em li pey bihna kebaba çûn, em rastî daxdana kera hatin
931. em ne ji malikêne, lê ji hewalikêne
932. em xursîne, ji malbatê em tivingcî ne, dwazdeh mal in sêzde risipî ne
933. em zanin çaço biraziyê axê ye
934. embarê derda tune ne
935. êmo ya şikakî rojê bi awakî
936. ên nuh hatin, ên kevn xelat in
937. ênişte bi gepirê girt û lênişte
938. erd birinc be, av rûn be, ko xwedî tine be wê zû xelas be
939. erdê têr bike, erd xwe dêndar nahêle
940. erdê têr cot û bidar bike, erdê te têr nan bike
941. erdê têr tov bike erd wê te têr nan bike
942. erdî rind nên didê
943. erdî xwe li ser desta ye, li ku baran barî li wira ye
944. erê pîr e lê fîstanî xwe bi heft qirma ye
945. erê, erê ye, na, na ye, erê na, bela ye
946. ereb û tembûr
947. eslê jinê jin e
948. eşq meriyan har û dîn dike
949. eşqê bor e bor e, ji wî were xelkî kor e
950. etar çi vê re be wê difroşe
951. etar helawê xwe naxwe
952. ev şivana ji vî pezî ra pir e, ev gavana ji vê naxirêra pir e, ev giriya ji vî mirî re pir e
953. êvara çekirinê qaliqî pîvazê ber derî neçê ye
954. êvara rijandinê avê germ ko pê serî hatine şuştin berderî neçê ye
955. evîn derya ye, yê ku bidî nav, diçe av û av
956. ew çi ye diçînî, şînbibê tê bibînî
957. ew jî elimî tirrê bin çenga
958. ew newêre di eyarî xwe de bilve
959. ewê destê xwe bêxe ber guhê xwe, ew dizane dê çi bêje
960. ewê ji te dûr dibe, reng bi te sor dibe
961. ewrê te birûska wî dît jê netirse
962. ewrî xur-xur pir jê bê carina baran jê nayê
963. extiyarî dojeha jiyanê ye
964. eyar di cîyî tenik re qukdibê

965. eyarê berêz e ne derzî pêkanê ne şûjin
966. eyb reş e şerm giran e
967. ez axa tu axa, dewar ma bê gavan
968. ez axe tu axe kî ê dewêr bajo
969. ez bê ez tu bê ez wê kî here ber pez
970. ez berê gul bûm baranê li min kir ez şil bûm
971. ez bi şev lê digerîm, bi ro bi des min ket
972. ez çiya tu çiya, kî wê ji golik re here giya
973. ez çûm bi lez, hatim bi bez
974. ez dên dikutim, intinî ji te tê
975. ez dengbêjim, dîloka nabêjim
976. ez di kefçîk av de difetisim
977. ez dibêjim bira, tu dibêjî kirîv
978. ez hêdî diçim bela dighêje min, bi lez diçim ez dighêjim belayê
979. ez herim ser kaniyê, wê kanî hişk bibê
980. ez li ezmên li te digerîm, min tu li erdê dîtî
981. ez mîr, tu mîr kî wê bibe wezîr
982. ez ne dikim nêçîrê, û ne dihêlim kew biçêrê
983. ez ne gihîştim te, ezê te bi xwe gînim
984. ez ne hêja me tenak genim, bi her kesî jî dikenim
985. ez ne hêştir im ku bi du ciyan şerjêbim (serjêbim)
986. ez nebûm bûk û li kerê siwar ne hatim
987. ez pîr-pak jê xelas bûm
988. ez te dibînim te bi bîra xwe tînim
989. ez wezîr tu wezîr, kî dibe kizîr
990. ez zanim û tu zane
991. êzdî baweriyê bi sûndê tênin
992. êzdî bê simbêl nabe
993. êzdî kirasê sipî ye gereke deq lê nekevin
994. ezê ji kîs xwe nên bixum û aqila bi xelkê dim
995. ezê pir buxum, zikî kê jî dêşê bila bêşê
996. ezê te tî bibim ser avê û tî vegerînim
997. ezmanê birrîbe seriyê vehesayî be
998. ezmanê dirêj darkûkê serê xwudanî xwe ye
999. fata por bi rişk e, bi quroşekî paleyê diçinê bi du quroşa quncirka ji xwe jê dike
000. fêda gavana, siwarbûna kera ye
001. fêda şîrê kêçê li dengizê dibe
002. fêdê vî çavî li vî çavî nabe
003. fêdê vî destî li vî destî nabe
1004. felek, hinek qawîna dixwin, hin jî keleka
1005. feqîr çû diziyê, hêv neçû ava
1006. feqîr dêst davên şûr
1007. filakî bi xêr, ji birakî bê xêr çêtir e
1008. filan kes bînî (wekî) mûyekî ji mêst derket
1009. filan kes cila şil e
1010. filan kes çîçeka bervero ye
1011. filan kes di kevçiyek av de difetisê
1012. filan kes dipijiqe wek encûrê kera, ( ango gelekî rû thel û tirş e )
1013. filan kes dûvê qantirê ye ne kindibe ne dirêjdibe
1014. filan kes ger kumê serê wî kesk bibe jî, şor jê nayên bawerkirin
1015. filan kes gewriya xwe dûz e
1016. filan kes gur e ewê diye
1017. filan kes î bin teştê ye (qird, mar, î ne çê,)
1018. filan kes ji bizina re çû nêrî
1019. filan kes kera dixesîne
1020. filan kes kerê ji bergîra re dikêye
1021. filan kes kerrika dicû ( şorêd boş dikê )
1022. filan kes kevrê binê bîrê ye
1023. filan kes kevrî hewre ye çîk nade
1024. filan kes kîrê adem e
1025. filan kes kora difetsîne ( qoneke )
1026. filan kes lingekî xwe li wê dinê ye, yekî li vê dinê ye ( bi awakî nêzîkê mirinê bû ye )
1027. filan kes manga bi ga ye
1028. filan kes marê bin zik-zer e
1029. filan kes mirîşka gêj e
1030. filan kes miya fisine ye
1031. filan kes ne ji defê re ne ji zurn ê re dibe
1032. filan kes neynûk tune xwe pê bixwerîne
1033. filan kes pirr tê difirîne
1034. filan kes pirrî bi kelema de berdide ( ango dîn e)
1035. filan kes pisîka dûv bi agir e ( diçe ku wir agir dike)
1036. filan kes pûş bela dike
1037. filan kes rêka dipîve ( virde wêde digere û kara nake )
1038. filan kes sepetê xwe sêreke ( bê hiş e, derewîne
1039. filan kes teniya bi done ( teniyê bi don zû ji mera nare )
1040. filan kes tiştî nake hewşê (naponije nafikire )

041. filan kes wekî kurka tim di ser hêlînê( hêkê )de ye
042. filan kesê qey kezeba gur xwariye
043. filan kesî
044. filan kesî çêlkên xwe xwarine
045. filan kesî derpiyê xwe di govendê de naskir
046. filan kesî wek tu mûyekî ji nav hêvîr bikşînê ez ji nav çopilmê derxistim
047. filan keso bû ye gurê dev bi xwîn
048. filan keso çav li roja reşe
049. filan keso mêş jê naêşe
050. fiqare fiqara bibin, parsekê jê bibin
051. firra mirîşka ta enîşka
052. firra mirîşkê ta kadînê ye
053. fis di nav sisiya de winda dibe
054. fis kir gû derket
055. fîstanê qîza sor e, çavê xorta kor e
056. fîşto qiçik li şûn xwe hîşto
057. ga bide gamiriya, jina bide jinmiriya
058. ga dimirê çerm dimînê, merî dimirê nav dimînê
059. ga diziye dibê
060. ga ku mir, gagora pir dibin
061. galgala ko ket nav dev û dirana, wê bigere li bajar û şaristana
062. gava dê bibe damarî, bav dibe filê gavarî
063. gava kûçik bezya gur, gur mir
064. gava mêvan tên pehra xwe jî bi xwe re tînin
065. gava xêr dibare gûyê sêwî ya tê
066. gava xwe li gor lingê xwe bavêje
067. gava xwedê bide ha rakeve, ha rakeve, gava nede ha li bakeve, ha li bakeve
068. gavan bê axe nabe, lê axe jî bê gavan nabe
069. gavkirinê di ser landikê ku zarok tê da xewkirî ra ne çê ye
070. gawir li hember zulmê misilman dibin
071. gawirî qert misilman na be
072. gawir-misilman jina didin hev
073. gayê bor re, fîtek mane ye
074. gayê dîn tim gulike, mêrê dîn tim zaroke
075. gayê enî beş e
076. gayê enî beş e, kuda herê nav li dû duxuşe
077. gayê qut e, ne mêşa li ser xwe kiş dikê û ne jî li ser hevala
1078. gayê sor sorîtiya xwe bernade
1079. gayê zexel e, timî li mexel e
1080. gayên qelp nîran dişkînin
1081. gayî kor li şûn afira dimînê
1082. gayî pîr, di nav cwanega da, ji tirsê qûnê xwe ra boxaniyê dikê
1083. gaz gaza te ye, caw cawê te ye
1084. gazid bilind bê ba nabin
1085. gazinid bûkê ji xwasiyê ne
1086. gaziya dû siwaran, naghîje xweyê xwe
1087. gelekî ne şêrîn be, tu wê li dilê hevalên xwe xînê
1088. geliyid kûr bê av nabin
1089. genimê yekî dişewite, ê fuqare got
1090. ger bi kesî nikane, bila li te neqewime
1091. ger bi sertiya biba heso wê aş bigeranda
1092. ger bi şuştinê sipî biba masiyê sipî biba
1093. ger bi xewê biba kêsefis ê maleka xwe çê kira
1094. ger bi xewê tiştek bi serketa kûsiyê bi serxista
1095. ger bidarî te kete çêle, buxwe û meçîne
1096. ger bulxurî te kêmbê hinekî jê bifroşe û pê rûn bikire
1097. ger bûm xwarina cinawira, bila şêr min bixwin ne rovî
1098. ger cixarê tê bi alîkî şewitî, wer zanibe çûndinê rêyekê li ber te ye
1099. ger dev ne devê te ye, çima tu deyn dikê
1100. ger di çûkayî de li zarokên xwe nexî, tê bi mezinî li kabokên xwe xî
1101. ger di riya avê de dişkê, pêlên mayî ji yên bihorî bêtir in
1102. ger dostî te dimis bê jî gişî melêse
1103. ger êrganbê mîre, bi jinbê wezîre, bavbê kizîre
1104. ger gir bibên em çiyan e, wê golik jî bibên em gan e
1105. ger goşt girane, nexwarin erzane
1106. ger hat hê hê ke ger çû di pê ke
1107. ger hate ber tu bide der, û ger hate der tu bide ber
1108. ger hate ber, dest bide ser
1109. ger ji malê pir, hate ser kavirê kur ew jî ne lazim e
1110. ger kanî sêlî bûn, cok jî wê sêlî bin
1111. ger keç çûn mala mêrê xwe, mila ji bîrbikin xesyeta mala bavê xwe

112. ger ker heşimî, ji hespa bezotir dibin
113. ger li deriya nexê derî venabê
114. ger mezin di mala de tine bin, kevrekî mezin wînin û di malê de dînin
115. ger mî ket deve di zikke ranabê deve bikevê miyê di zikke deveyê rabê
116. ger mirov li masiya bêt, qûna mirovî dê terr bît
117. ger mirov xirapa nebîne, başa bi bîr nayîne
118. ger ne fen e, ev çi ben e
119. ger nebî kûçik, peran naxî hûçik
120. ger pisîkê mişkekî xwe girt bêjinê pisîka me şêrekî xwe girtî ji bo dranê pisîkê netevizin
121. ger qadî nebin, kumî xwe bike qadî
122. ger rabûnek miriyan heba, wê bi şuştinê rabana
123. ger rûmetî di mûyan de bûya, wê bizin hilfiriyana asmana
124. ger sêwiya xêr bidîta roja îdê zik nedêşan
125. ger simêlê lawa biderketin gerek bav simêlê xwe kur kin
126. ger te derbek danî, zerbekê nebîne
127. ger te fîlerê xwe êxistin û li hev siwar bûn, wer zanibe çûndinê rêyekê li ber te ye
128. ger tê xweliyê li xwe bikî, bila xweliyek germ be
129. ger tu çû mêvantiya gura, kûçkê xwe bi xwe re bibe
130. ger tu dizbî, şevên reş gelekin
131. ger tu pera li erdê bibînê jî bijmêre
132. ger tu yekî di xewnê da bibînê, balgiyî xwe wergerîn, wê ew jî te di xewnê da bibînê
133. ger xwedê da, kes nikanê bistînê
134. gere çar lîtir qûna mere hebe, mera karibe bi çar qurişa tê de cî bide
135. gereke lîwanê devî meriyan hebê, ji bo her şorekê nekê
136. gereke mirov dost û dijminî xwe li serhev derkê
137. gereke mirov şa nebê bi malê gir û hûr û ne bi gerdenê stûr
138. gêrik per didin mirinê wan tê
139. gêrik per didin, dimirin
140. geriye diriye
141. germ e, cil şerm e; sar e, cil yar e
142. gêrmiya kundir e, ji qe çêtir e
1143. gêrmiya xwe kiriye, û kefçiyê xwe pê hilpesartiye
1144. gêrre bi golkan nabe
1145. gi bi nirînê têr bixara kûçka wê têr bixara
1146. gi di ber dimsî pêximber ra derbasbê wê bêçiyê xwe vêxê
1147. gi ne ji fesada ba, roviyê li çarşiya bigeriya
1148. gi ne ji milawisa bê gur û mi wê bi hevra biçerin
1149. gi te pişt xar kir, êd kevra di ser te kin pir in
1150. gi werê qerezê, ti kes nikanê bi derbo re bibezê
1151. gilgil ne ti ware lê jê bêtir nîne
1152. gîsnî bi kar ne yê, zingar digre
1153. giya li ser kokê xwe şîn dibê
1154. giyayê qeraca, malê muhtaca
1155. giyayî hewşê tehl e
1156. goçero, bide awê xwe yî berê
1157. golkê bi du-sê makan carina birçî jî dimînê
1158. golkek navî naxirekê pîs dikê
1159. goreyî rû şeqamê lêde
1160. goşt bi kutanê pir nabê
1161. goştê xwe nespêre kidika
1162. goştî belaş nabe şîv
1163. goştî destid xwe buxe, malî sêwiya mexe
1164. goştî diziyê naxwê, lê nanî xwe bi avşorkê goşt duxwê
1165. gotin em te têxin cinetê, got, roj ne xweş e
1166. gotin feqîro! çima xizanî, got, ji nezanî
1167. gotin jojî, were ser xelîçê, go, bi girnîş e
1168. gotin kerengo ciyê te li ku ye, got, ba zanê baran zanê
1169. gotin kitkê gû yê te derman e, rabû rît û ax rada ser
1170. gotin koro te çi divê, got, çavek
1171. gotin koro tu li çi digerê, got
1172. gotin kûçik
1173. gotin orispiyê çima avis nabî got, yek çê dike deh xira dikin
1174. gotin pisiyê
1175. gotin qantirê
1176. gotin tu ji kuderê ye, got
1177. gotin, heye zêr e, gotin jî heye zêhêr e
1178. gotina bikeve nav du lêvan, dikeve nava du gundan
1179. gotina jinê, dawiya dinê
1180. gotina paşî berî ya pêşî nebêje

181. gotina rast bi mirov ne xwaş tê
182. gotina xweş mara ji qulê derdixe
183. gotine kerê, ka em te bibin cinetê, got
184. gotinê pêşî bibêje paşê bêje
185. gotinê tu ji ku ye, go, dera ku min jin jê ani ye
186. gotinên êvara dikevin qulê diwara
187. gotinên mezina nexşêt berî ne
188. gotinên mezinan, nexşê ser keviran
189. govenda mişkan di mala feqîran de ye
190. guh didim ê bilor e, deng tê ji kûr e, pez birçiye li bûr e, ro bilind e av dûr e
191. guhê zaroka bêşin, dûyî cixarê hûfêkin yan jî bin guh bi derzîkê dax din êşê jê here
192. guhekî xwe bi bêjing ke, yekî bi serrad ke
193. gul be gula biharê li bin darê çinarê
194. gul bê istirî nabin, rind bê kêmasî nabin
195. gul bê qisûr nabin
196. gul ew gul bû, baran jî lê hat şil bû
197. gul hene gula winda dikin, kulin jî hene kula winda dikin
198. gul jî bi istirî ne
199. gul jî di zibil de şîn dibin
200. gul li gulê dinêre, sor dibe
201. gula govenda, bûk e
202. gula ku her kes bênke, bên tê de namîne
203. gulan e, dew li ba hemiyan e
204. gulek biharê nîn e, lê nîşana biharê ye
205. gund bê rez, kon bê pez nabe
206. gunehkar ziman kinin
207. gur be bila gur te nexwin
208. gur berî bighê nav pêz, devî xwe ji hev dikê
209. gur bi du pariya namire ( gavê kesek jinan bike didu vê gotoinê dibêje )
210. gur dikujin, qijak dixun
211. gur girtin şîret kirin, got
212. gur hat diyara, wey li sêfîl û jara
213. gur ji gazîna bitirsiya, qe li çiyê ne dima
214. gur ji nêza nikanî hilkişya çîyê, digotin, hincî zik dagirtiye
215. gur kal dibin rovî bi wan dilîze
216. gur ku dikeve nav keriya, ji kêfa re dev tê girtin
217. gur li dû parî nerm digerê
218. gur li ku be gurîtiya xwe dike
219. gur newêrin li dû hev bimeşin
1220. gur oxir e, nebînî çêtir e
1221. gur pîr bibê dibê qeşmerê roviya
1222. gur pîr bûn, dibin qeşmerên cewrika
1223. gur tê pêz, ekê ( gû ) kûçik tê
1224. gur tê pêz, kûçkî pîs xwe li xewi dinê
1225. gur û serçe kedî nabin
1226. guran xwariye hirç mane
1227. gurê di bin kevilê mî yê de ye
1228. guyê (gûyê) mişkan di qulikên dîwaran de pir in
1229. ha çoyê şivên ha qoçêd berên
1230. ha diranê kûçik, ha eyarê berêz
1231. ha ji dest ha ji zend
1232. ha şoreka xwe kirî, ha tire ka xwe kirî
1233. ha te kir hûr, ha te kir tûr
1234. hahekirin heye ga kedî dikê, hahekirin heye ga tor dikê
1235. hat ji welêt, bû xudanê ferêt
1236. hat ko poz paşkê çav kor kirin
1237. hate ciyê min, rabû li riwê min
1238. hatin ji çol û çolistana, bûn xwediyê dar û daristana
1239. hatin nav me bûn xwediyê me
1240. havîn çû kerasê fiqara da dû
1241. havîn kirasê xezanane
1242. hebê şilik û milik, nebê keser û kulik
1243. heblûr li yekî werin, li ber hêvê panzdeşevî bi sibirgê rêşke wê heblûr biweşin
1244. hebûn mera dike axa û xatûn
1245. hebûna îsê min hebe, wê pir hinga (tona) bike
1246. hebûnê xatûnê, tinebûnê teleqûnê ,,
1247. hecî heciya dibînin li mekê, sofî sofiya dibînin li tekê, bênamûs bênamûsa dibînin li ekê
1248. heçî biçe masiyan dê qûna wî şil bibe
1249. heçî bixwazê mala xwe bê west xirabikê, mila du jina bînê
1250. heçî kirrî û firot dinya ji xwe ra dot
1251. heçî li ser sê singa bilîze, dê yek biçe têde
1252. heçî neke xeberên mezinan, wê pêve bê du şaxên bizinan
1253. hêdî tif bikî, wê li rû yê te bikeve
1254. hefsarî şora tine ye, te bi kude bada wê wirde herê
1255. heft avjenî kera hene dikevin avê her hefan jî ji bîrdikin

256. heft birçî heft dev vekirî
257. heft hevling ketin bin bêjingikê û gotin
258. heft hevling li ser doşekikê rûniştin û gotin
259. heft kirîf bi gopalekî, heft mal bi arvanekî
260. heft kirîf li barekî hatin hev ku barkin hîn gotin
261. heft kulam hurçê hene, hemî li ser hulyan e
262. heft mêr kirin û ji derdî mêran re jî xeyaran dalêsê
263. heft pişt girêdayî ji yekî pişt vekirî ra kar dikin
264. heft soberiyê kerê hene, dikeve avê ji bîr dike
265. heftê û du derd ji sermê ne û derdek ji germê ye
266. heger nekewîne, ne xo ye
267. heger virr bin mila pirr bin
268. hêk bi tirra naqewirin
269. heke mirov ji rezekî tiri xwaribe, nabe pişta xwe bidê yê
270. heke te bivî tu hebî tê nebî, heke te bivî tu nebî tê hebî
271. heke tu gul nebû, strî nebe
272. hêkerûn nebû mila cilbir bê
273. hele bila dar bikefê, ka berî ku da
274. helhela gavana siwariya kera ne
275. hemî ewr baranê nînin
276. hemî keran bi şivekê ne ajo
277. hemî tişt li bendê demê ye, lê dem ne li bendê tiştiye
278. hemû hevrazan, deberjêrekî wan heye
279. hemû mêr nabin şêr
280. hemû teyr nêçîrê nakin
281. hên av dûre, xwe hilmemale
282. henek dibin genek
283. henekên wî henekê hirçê ne
284. heps ciyê mêran e
285. heqê dê weke heqê xwedê ye
286. heqî ji des neheqiyê zarezar e
287. her biznek li karê xwe dibanê
288. her carê kûçikek birewê tu kevrekî bavê yê, kevir namîn in
289. her çavbelekek çavreşek li dû ye
290. her darek bi berî xwe tê naskirin
291. her dîkek li ser sergo yê xwe qî dikê
292. her dîkek şahê pînka xwe ye
1293. her gelîkî dengek jê tê, her gulekê bihnek jê tê
1294. her gulekê bênek xwe heye
1295. her gulîsorek çavreşek li dûv heye
1296. her gulîsorek simêlzerek li bendê ye
1297. her kaşekî kûşekî xwe heye
1298. her kehrek derê bin dêkê xwe
1299. her kes bi gazê xwe caw dipîvê
1300. her kes bi xwe qayîl e
1301. her kes bi xwe û bi dilê xwe şaye
1302. her kes dibê ez lawê bavê xwe me
1303. her kes dînên bê cil nasdike, esil ewe dîn bên naskirin bi cilan ve
1304. her kes ji xwe razi ye, çi kizîr e çi qazi ye
1305. her kes li mala xwe qeral e
1306. her kes orxanê ber xwe dikşînê
1307. her kes têvr berve xwe lêdixe
1308. her kes û riya pêşi ya xwe
1309. her kes xazi ya wî di devê wî de şêrîne
1310. her kevrek li ciyî xwe giran e
1311. her kilîtek ji derîkî ra ye
1312. her malek dînekî çêdikê
1313. her nêr li mê sware, tenê gotina mê li ya nêr sware
1314. her qubakê ku sipî kir ne mizgeft e
1315. her rojekê padişakî xwe heye
1316. her sebrekê xêrek vê re ye
1317. her serîkî aqilek tê de ye
1318. her şevek avisa roja xwe ye
1319. her teyrek bi refê xwere difire
1320. her tişt bi demê ra mezin dibê, tenê xêlibûn bi demê ra biçûk dibê
1321. her tişt di destê hosta yê xwe de başe
1322. her tişt di destê xwedê de ye, lê dewê malê di destê pîra de ye
1323. her tişt di wextê xwe de xweşe
1324. her tişt ji ziravî mirov ji stûrî diqete
1325. her tişt li demê dinêre, dem li tiştekî nanêre
1326. her tiştî zani be, lê her tiştî meke
1327. herçî jar e, li havînê jî sar e
1328. herçî li ser du singa bilîzê, rojekê singekê di kûnê ve herê
1329. herdu dizê qulekê ne
1330. herdu ling kirin solekê
1331. here ba wî kesî yê te bigrîne, nere ba wî yê te bikenîne

332. here mêvaniya li nav neyaran, lê bê çek neçe
333. herin şênahiya, pirskin ji zarokan
334. herkes hesinkerê bextiyariya xwe ye
335. herkes mêrê roja xwe ye
336. herkes xwe li ronahiyê digre
337. hêrsê te li tersê te
338. hesîl xiranabe, hingiv genî nabe
339. hesin hesin dibire
340. hesin ji hesinkera nayê kirîn
341. heskoyê got
342. hesp bi hev dikevin, ker û golik di navda diçin
343. hesp dibezin siwar xwe dipesinin
344. hesp heye meydan tuneye, meydan heye hesp tune ye
345. hesp qevda şûr e , kî bi serket ma ji wî re
346. hesp û qantir li hev dixin, ker li ber lingên wan diçin
347. hespan gem û hefsar, mêran bext û qerar
348. hespê her kesî li gorî bextê wî dimeşe
349. hespê nêr ji simê xwe şerm nake
350. hespekî ji cîranê xwe re bixweze, da xwedê kerekî bide te
351. hespî çê ji siwêr e
352. hespî çê xwedanê xwe li rêka nahêle
353. hespî kihêl zengiya nagînê xwe
354. hespî xwe rind girêd û kumî xwe li yanxe
355. hestî ji kûçka nayên standin
356. hestiyê bê minet, çêtire ji goştê bi minet
357. hestiyê zimên nîn e
358. hestiyên me têre kûçkên me nakin
359. hêstiyid çavid yekî bikevin, hestîk di şiketê dêv da heye wî hestî bi jor da têvedin, ê çê bibê
360. hêştir bimexelê, wê ciyî xwe bigrê
361. hêştir birçî bû, ji hewatî xwe duxwê
362. hêştir çiqa bi borborkê, ewqas bar lê giran dibê
363. hêştir çiqas mezine zarokek sêri dikşînê
364. hêştir çiqasî girse, gurê xwe yekî biçûke
365. hêştir ji hev dûr diçêrin lê guhên xwe li ser hevin
366. hêştir radibin hev, hêstir û ker di bin lingê wan de diçin
367. hêştirek bi heft cenicilûka nabê
368. heta aqilê paşî hat, ê pêşî çû
1369. heta barê qantirê giran nebe nizanê ker bavê wî ye
1370. heta cû rast nebe, av nayê berdan
1371. heta genim firîk e, mele şirîk e
1372. heta hate ser hev, dawet çû ji ber hev
1373. heta mar rast nebî naçe qulê
1374. heta mi xwe naskir, mal li xwe xelaskir
1375. heta pexîl hebin, miflis namirin
1376. heta rûvî xwe îsbat bike, postê here çarşiyê
1377. heta serî sax dimîne, qûn ecêba dibîne
1378. heta te dêrek ava kir, te mizgeftek xira kir
1379. heta tu ber piyê xwe nebînî gava xwe ne avêje
1380. hev şivana ji vî pezî ra pir e, hev gavana ji vê naxurê ra pirtir e
1381. heval hene yên rojên xweşin heval hene yên rojên reşin
1382. hevalê qirikê her nikilgû ye
1383. hevalê rê, birayê ji dê
1384. hevîr tirş nebû ye, tenûr dada ye
1385. hêviya dera, xuliya li sera
1386. hevraz bê berjêr nabin
1387. hevrîşim bi biha yê xwe, hirî bi biha yê xwe
1388. heware, avê ez bi lêde birim, û ez ji tîna mirim
1389. heya heye şilik û milik, gava nema keder û kulik
1390. heya serî mera li darheda nekevê mera baqil nabê
1391. heya tu li karê xwe nepirsê, kes li te napirsê
1392. heye li derî bizire wekî kerî, ê bên digîne me xweş xeberî
1393. heye terk, nîne berk
1394. heyfa bizina kol ji ya bi qoç re namînê
1395. heyfa hêverûnê şevreş li dû ye, heyfa buharê havîn li dû ye, heyfa ciwaniyê pîrbûn li dû ye
1396. heyfa miya kol ji miya kel re namînê
1397. heyfa serê ko çû
1398. heyfa taveheyvê, tarî li pê ye
1399. hezar bavê çê, esil şîrê dê
1400. hezar bizin di sersiyî darekê de dimexelin
1401. hezar carî bipîve, carekê bibirre
1402. hezar dot, hezar firot, neghîşte xeta cot
1403. hezar û yek çîrokê hirçê hene, hemû li ser hulmê ne

404. hildidim mildidim çava kil didim
405. him ji dêrê bû him ji mizgeftê
406. him serê xwe dişkîne, him xercê xwe dide
407. himhima şêx ji bo kevçîk rûne
408. hin ê bistrên, hin ê tewkin
409. hîn gi serî mirîşkê di pînkê da ye, bihêle dîk bikopisînê
410. hîn hêlîn (hêk) bi poz va ye dixazê mêraniyê bikê
411. hîn marî biçûk e, sêri biceliqîne
412. hin nekin, hin naxwin
413. hîn nexwariye, xwedê spas kiriye
414. hîn şîvê te di tewikê da ye, haj xwe hebe
415. hina tepir îçi tiji şekir, hina belan îçi tiji qitran
416. hindik bixwe, hindik xeber bide, hindik raze
417. hîngî dev li dêv hatiye, çêke
418. hingî ez singekî dikutim, tu çelteyekê pêvedikî
419. hingivê te nebê, mêş li te nacivin
420. hirç bi mezini honabê reqasê
421. hirç diye, li dû şopê diçe
422. hirç reqisî ker fetisî
423. hirç û bilûr, ereb û tenbûr
424. hirç û govend kê dîtiye
425. hirç û qûn şuştin
426. hirça birçî nareqisê
427. hirçekê tûyek xwarî
428. hirî li ser pişta miyê nayê firotin
429. hirmiyid tevî baş hirç dixwin
430. hisqînkid kesekî hilên bila heft gulp av vexwê wê biskinin
431. ho derê li ho dinê, mêş derê li gû dinê
432. hohoke karê bavok e
433. hov ji bo xwarinê, mirov ji bo avakirinê
434. hukumdar bibe pir, di ser ra derbaz nebe
435. hûr bajo kûr bajo pir bajo ga mêşîn
436. î ço ya dixwê û î dijmêrê ne wek hev in
437. î çova dixwe, ne wek î dijmêrê ye
438. î dest bi gû bi î dest bi herî dikene
439. î gur di zik da ye
440. î ko di govendê kefê wê xwe bihejînê
441. î ku bixwazê rûyek reş e, î ku nedê herdu rû reş in
442. î ku buxwazê hingivî kewarê buxwe, ê pêvedanê mêşa tehmil kê
1443. î ku dest û pê yid mera bikin, dê û bavid mera nakin
1444. î ku dînek ji xwe ra zanê heft baqil jê re nizanin
1445. î ku fedî bikê, qiçkid xwe nabin
1446. î ku herê navbera, ê hesabî serşikandinê xwe bike
1447. î ku herê nêçîrê masiya, ê xwe bidê nav qûntaziya
1448. î ku ho bû goştî beraza, nikanê dev jê berdê
1449. î ku ji malê xwe de ne têr be, li malê xelkê têr nabe
1450. î ku jinek kanê bikê, êlek nikanê bikê
1451. î ku li bendê şîvê cîrana bê, carina birçî xew dikê
1452. î me bi reng û penge î xelkê bê hus û denge
1453. îhîna hesp ji bin gunê ga ye
1454. înan nedikir bi destkevê ,bi desket û go
1455. îne, mela dîne
1456. însanê bê esas, ne dibe tevir ne dibe das
1457. îro derzîk dizî, siba wê deve bidizê
1458. îro heye, siba tineye
1459. îro nebû mila siba bê
1460. îş nabin xewn
1461. îşî ber lingî xwe, mebe ser serî xwe
1462. îşî ko bi stûyî te de neketî xwe çemekê
1463. îşî ku bûye jê metirse, ji yê ku ne bûye bitirse
1464. îşî xwe tiriyê
1465. jana her pênc tilyan jî yek e
1466. jehr ji çêliyên mara qutnabe
1467. jehra marî ji marî naçe
1468. ji ava bêdeng dikşê bitirse
1469. ji avê çelq metirse, ji ya meyî bitirse
1470. ji biznekê du eyar çê nabin
1471. ji bo xatira mera derê ser dînî gawira
1472. ji bo xatirî çavekî hezar çav tê xwedîkirin
1473. ji bo xudana mera kêvir navê kûçika
1474. ji cîrana mera hodibê îzana
1475. ji dehan nebû, bila ji nehan bê
1476. ji delava ket çirava
1477. ji derd û kula dengbêje
1478. ji derdê xuhê dil ket birê
1479. ji dijminî xwe yî dijmin metirse, ji dostî xwe yî dijmin bitirse

480. ji dûr nagihê ber ûr
481. ji eşqa re ling nagînin erdê
482. ji eşqa re tirr bi dawê nakevê
483. ji heft salan salek sala seyan e
484. ji heft xêra xêrek nema
485. ji hemo fermanan re serê xwe berjêr bikî, tê bibî kole
486. ji hesinê xirap şûrê baş çê nabe
487. ji hêsp peya bû li kerê sîwar bû
488. ji hêştir ketiye û ji hop-hopê xwe namînê
489. ji hêştir pirs kirin
490. ji hêştirekî guhekî dide
491. ji jêketiya metirse ji nûvêketiya bitirse
492. ji kaniyê bibe kanî bi şîr e
493. ji kar netirse mila kar ji te bitirse
494. ji kera re kerbeş, ji hespa re ceyê reş
495. ji kera re tim li daholê de ker çi zanê dahol çiye
496. ji kerê yi gi manker horiye
497. ji kesê diz ve, xelk giş diz e
498. ji kêw pirskirin kuder bi te xwaşe got
499. ji kirinên şêx û melayan, dîsa rehmet li cahîlan
500. ji koran re bihayê mûma xem nake
501. ji mala xwe têr nane, ji mêrê xwe têr gane
502. ji maran tazîtir e û ji guran birçîtir e
503. ji melê bangdane
504. ji mêra nav dimîne, ji gayan çerm dimîne
505. ji min bereket
506. ji minê, li minê çetintire
507. ji neçari mera goştî dîka dixwe
508. ji neçarî mera li cem xatûna xew dike
509. ji nedîtî re kurek bû, anî kîrê wî jê kir
510. ji nîskê dike gîsk
511. ji qelemî mêrik zêhêr dibarê
512. ji qûna mera pîstir tune ye, ji mera nabe
513. ji revê em naghên lêxistinê
514. ji rinda ve xelk gî rinde û ji pîsa ve xelk gî pîse
515. ji riya kir di simêla da
516. ji roviyekî du post dernakevin
517. ji sipi rişka xelas bû, yan jî dibên xelas kir
518. ji te ye ko meraş gund e
519. ji xelkê re mirîşk e, ji min re dîk e
520. ji xelkê re pispore, ji xwe re kor e
521. ji xudan esla bipirsin, ji bêeslan bitirsin
1522. ji xuşxuşa gêj bûm, ji tîna lal bûm
1523. ji xwe re masîgir e, ji xelkêre kûsîgire
1524. ji ya qelsemêran ve laşê egîd û pehlewanan na êşe
1525. jin bi maçkirinikê kûnde nabin
1526. jin bi porê xwe rind e
1527. jin bi xeftana, mêr bi qapana
1528. jin bixwaze, mêrê xwe dike wezîr jî, dike rezîl jî
1529. jin di ser jina ra hene, jin dikarê rûyê mêrê xwe sipî bikê, û jin heye karê rû yê mêrê xwe reş bikê
1530. jin dibêjin
1531. jin dil bikê, wê dîwara qul bikê
1532. jin dîwarê hundir in, mêr dîwarê derva ne
1533. jin gî ne jin in û mêr gî ne mêr in
1534. jin giş ne jin in, destar jî qul in
1535. jin gol e, mêr çem e
1536. jin heye gula mêrê xwe ye û jin heye kula mêrê xwe ye
1537. jin him gul in, û him kul in
1538. jin hin jinin hin janin
1539. jin jî hene, jan jî hene, melhema dilan jî hene
1540. jin jî hene, jinkok jî hene
1541. jin jin bê, bira li ber du dara bê
1542. jin kanin rû yê mêrê xwe sipî jî bikin û kanin reş jî bikin
1543. jin kaniya jînê ye, mêr agirê tinê ye
1544. jin kela mêran e, jin dayîka şêran e
1545. jin kela mêran e, û mêr hene karê wan rev û bazdane
1546. jin keleh e mêr girti ye
1547. jin mêra hiltînin jî, datînin jî
1548. jin roniya malane mêr stûnê malan e
1549. jin ya bi axê disitirin, ya bi mêra
1550. jin yek e, malê seke zebeş ji çiwêl dibarin
1551. jina baş şûrê pişta mêran e
1552. jina bidin jinmiriya, kera bidin kermiriya
1553. jina bira eyarê serê min gura, kir tûtik (pîk) heft sala têde stra
1554. jina çê hêjayê hemo dinê ye
1555. jina çê hêjayî gundekî, mêrê pîs bi dûvî kundekî
1556. jina çê mirov dike wezîr, jina xirap mirov dike rezîl

557. jina ne delal çavê mirov dêşîne, jina delal dilê mirov dêşîn e
558. jina pîs kul û derd e
559. jina pîs mêrê baş pîsdike, jina baş mêrê pîs başdike
560. jina rind bi êlekê, jina pîs bi sêlekê
561. jina rind buhara mêrê xwe ye
562. jina zû razê, mêrê xwe zû pîr dike
563. jinê bi namûs di nav komek leşker ra derbas bê jî, eniyê xwe hilmiştî ye
564. jinê çê ji mêr e
565. jinê rind taca serî mêrî xwe ye
566. jinê te rind bê, mere dewata; jinê te pîs bê, mere ser miriya
567. jinê û mêr şer kir, nezana bawer kir
568. jinid pîs çavid mera dêşînin, jinid rind dilî mera dêşînin
569. jinka bê xwedî ji kesî nakê fedî
570. jinka têr ji xwediya nakê fedî
571. jintî bi hev re başbin, bira wê ne şaşbin
572. jûjî destê xwe dide istiriyê xwe dibêje
573. ka kî berx e kî beran e
574. kalbûnî çekek e çerxûte ye
575. kalê bi yar, havîna du bihar, pîra guh bi guhar
576. kalê eceman li ber bostanan, kalê kurdan li ber berxan in
577. kalê ji bênefsî, pîrê ji bêkesî, yek bi ê dî pirsî
578. kalkî bavên xweşiya, xortkî bavên reşiya
579. kanê di kevçîk av da avjeniyê bikê
580. kanê heft gunda bi barkirin bidê û li gundî heştê jî rûnê
581. kanê heft roj heft şeva di aşekî xirabe da xewkê
582. kanê heft rojan di aşekî xirabe de xewkê
583. kanê heft şîva di biroşekê da bikê û yek bi yekê de venedê
584. kanê li ser heft kêndira bilîzê
585. kanê xwe di qulê derziyê ra derbaz kê
586. kanî ji serî ve şêlî dibe
587. kar di kirrînê da ye
588. kar ker e, te ajot ê here, te najot nare
589. kar şêre, te dest avêtê dibe rovî
590. kar û zirar bira ne
591. kara bike lê tînê nede xwe
592. kara necara, qoşilê ( qaşil ) dara
1593. karê demekê, çêtire ji axiftina salekê
1594. karê fate tîzê ye, bi perakî pehlê diçinê, bi du pera quncirka ji xwe jê dike
1595. karê gavkî, xemên salkî
1596. karê karkera, namûsa xatûna
1597. karê mehmûdê kinê li bin konê ereba çi ye
1598. karê mêra tevr û bêr e, xemla jina zîv û zêr e
1599. karê ne ji mi re, ba yê wê di ser mi re
1600. karî (kehr) pîs te kir nêri, wê hilpekê diya xwe
1601. karker hezar in, serok yek e
1602. karkirê karî xwe be, şêrînê hevalî xwe be
1603. karkirin xweşî û dewlet e, nekirin xizanî û zehmet e
1604. karzanîn, bazingê zêrîn
1605. kaya havînê bavêj kadînê
1606. kaya kadîna, golik radikin
1607. kê golik berda, ewê girêdê
1608. kê kire kê, jê re ma
1609. kê tişt ji meriyê xwe xwast, bila di tûrî paçî de bixwazê
1610. kebanî êjdil li ber darî dergûşê xiya dikê
1611. kebanî, bi heyk meyka mala xwe zanî
1612. kebeniya zexel nanê wê xav e, û bêbextî takî zirav e
1613. keça bê bav û dê, êvarê diçe sibê tê
1614. keça çê rûsipîti ya bavê ye
1615. keça malê bi rûmet e, karê wê bi minet e
1616. keça mîra, bi qelenê gavana nayê
1617. keça nexwende gulek vê bîn e
1618. keçel dermana naskê, wê li xwe bikê
1619. keçel hekîm bûya wê dermanek ji serê xwe re bidîta
1620. keçel ji serkukirinê natirsin, ji şorafkê paşi ditirsin
1621. keçel mir, gulî mor dibe
1622. keçên jîr di çinîna tirî de xuya dikin
1623. keçikê, rû -nermikê, xorta dev xist qirikê
1624. keda helal dib mû lê naqete, keda heram bibe werîs jî diqete
1625. kefa dest reşnebe, tamê dev xwaşnabe
1626. kêl bimirin, dibêjin poreşê min; kor bimrin, dibêjin çavreşê min
1627. kêl dimrin, temri sor dibin
1628. kel pel ûrî bel

629. kêla min serî xwe şenakê ille bi şeyî mûşkin
630. kêlê uziya tiji nabê
631. kelex ket, kêr mise dibin ,,
632. kêm bêje pir bike
633. kenê zehf girî tîne
634. kepekê ber ervanî bavkî xwe bixwe ji qawirmê xelkê xweştir e
635. ker bi gem û hefsara, mêr bi soz û biryara
636. ker bi kerîtiya xwe li ciyê bikevê, carek dî tê ra nare
637. ker bi naxirê re ye, pirsê ji şivên dikê
638. ker bikevê, ji xwedana xurt tir nînin
639. ker dikin, hesp dixun
640. ker dimirê kîr namirê, merî dimirê dil namirê
641. ker dimre, kîr namre
642. kêr giha hestî
643. kêr gihişte hêstî, hên tevir î di darê da
644. kêr heta tûj dibe, gelek çakûçan dixwe
645. ker hinda kirî li kurtên digerê
646. kêr ji birînê dertê, lê şopa wê dimîne
647. ker ji lêxistinê re, hesp ji bezê re
648. ker ket heriyê, ji xwedî pê ve kes ranehişt teriyê
649. ker ket kurrê (herî), ji xudî mezintir nîne
650. ker ku ji merîyan tune bin, her yek wê were hezarî
651. ker li bavê xwe pix kir
652. ker li kurtên nîşt
653. ker li kurtên nîşt kûr li kût nîşt
654. ker nabê qurban, lê perê kerê qurban pê tê kirîn
655. ker sibirgêd mlan e
656. kera li ba hev girêde, ji hev ho dibin tir-fisa
657. kera me miriye, ew jî li av-dewşiyê heyiriye
658. kera xwe bi ker da cilika xwe bi serda
659. kerê bi perakî, kurriyê bi zaltakî jê dibin
660. kerê çibkê bi bêhna gulê
661. kerê ku barê mera lê tune be, merî najo
662. kerê nemir bihar ê tê, pîrê nemir pincar î tê
663. kerê reş dixwe tiştê xweş
664. kerê te li ku biwestê, nikanim xanekê li wir ava kim
665. kerê xwe bi singekî xurt ve girede, cîranê xwe meke diz
666. kerê xwe ji merî şerûd dûr girêde
1667. kerê yekî tim dizirî mêrik got ê
1668. kerên guh sist, tirrên şidyayî dikin
1669. kêrguh jî dibê xwedê, taji jî dibê xwedê
1670. kêrguh jî dibê xwedê, taji jî dibê xwedê, kîjan bezatir bê ewê bi ser î din dê
1671. kêrguh rabû, çola ( destav) tajî hat
1672. kêrhatiyan ji kêrnehatiyan biparêze
1673. kerî nezirî gi bizirê çare lê nabê
1674. kerra bi guh neke
1675. kerriyê ne bes, koriyê da ser
1676. kes aqilî xwe nadê bi aqilî kesî
1677. kes bi lingî xwe nare tirbê
1678. kes bi temaşa nabe paşa
1679. kes ji nêza re namirê
1680. kes li ber dara xweziyan rûneniştiye
1681. kes nabê li ku ye bavê te, tev dibên li ku ye diya te
1682. kes nabê te çi xwar, giş dibêjin te çi anî
1683. kes nabêjê dewî min tirş e
1684. kes newêrê bêjêyê kêlê kêlmêşê
1685. kes nikanê bêjê yê kemûnê kem
1686. kes nikane qismetî kesî bibe
1687. kes ti tiştî bi xwe re nabê tirbê
1688. kes, bi revê li ber dijminî xwe xelas nabê
1689. kesê hevalê deveciyan be, derbazê wî mezin dibe
1690. kesê jinekê bîne, divê an tûrek perê wî an jî barek derewê wî hebe
1691. kesê kar bike birçî namîne
1692. kesê ku têkeve dîlanê wê xwe bihejîne
1693. kesê mirinê dibîne bi nexwaşiyê razî dibe
1694. kesê ne li malekê, nizanê bi halekê
1695. kesek jê nemirî guliyid xwe dibirî
1696. kesek nabê kerî te bi çend pera ye
1697. kesera giran ji mala zengînan tê der
1698. kesî fuqare tune ye, ê fuqare li nav gora ne
1699. kesî ji weqiyê tune ye, giş ji lîtirê ne
1700. kesî li pê mirî ya mirî tune ye
1701. kesî qala gurî ne dikir rabû di devê kaniyê de gû kir
1702. ketî bi xebatê radibe
1703. ketim otesiya dinê, neketim otesiya mêr û jinê
1704. kevanî (kebanî) sisê, meşk ma li sêpê
1705. kevçî kodik li me hişk kirin

706. kevçiyê mera tune be, mera bi kevçiyê xelkê têr naxwe
707. kevilê bênamûsan fireh e
708. kevir ji ciyê xwe tol be, wê bi hezar perçebe
709. kevir li heriyê xist
710. keviravêjên sêva sor pir dibin
711. kevirê kora li binê bîra
712. kevirê mezin ne ê nîşanê ye
713. kevirê tol bê, ê li ciyî rast bisekinê
714. kevn e pîr e, ji gotinan re bîr e
715. kevra hilke şûnê bi dar ke
716. kevra mîne bîrî diza
717. kevrê aşê çiqas giranbe jî, aşvan bi fena xwe wî radike
718. kevrê havînê çek bin qulînê
719. kevrên mezin bi yên biçûk disekinin
720. kevrî giran li ciyî xwe dimînê
721. kevrî hewre çîknadê
722. kew dijminê serê xwe ye
723. kew li rûyê kêw dixwîne
724. kezeb çiqa şêrîn be, şîret jê şêrintir e
725. kezeb di ser her tiştî ra ye
726. kezeb gurê har e
727. kezî rewşa qîzan e, simbêl rewşa lawan e
728. kî bêjê hirt, tê bêjê zirt
729. kî bêjê û bikê mêr e, kî nebêjê û bikê şêr e, kî bêjê û nekê kîrê kêr e
730. kî bi lez here wê zû jî biweste
731. kî bibê hevalê mirîşkê pozî xwe wê di pîsiyê da bê
732. kî bibe hevalê mirîşkê, nikilî xwe ji gû dernakvê
733. kî bûk bê mila bûk bê tu her berbûki
734. kî çêl şorî bikê wê bibehcê
735. kî dengkê, ewê golik berdê
736. kî dibê ez xal im, ew dibê ez heval im
737. kî hesaba nekê, wê bê hesab here
738. kî ji avê bitirse, ho nabe avjeniyê
739. kî ji çivîka bitirse, nikare gêris biçîne
740. kî li benda yarê bê, ê bê jin bimînê
741. kî li karê ye, li harê ye
742. kî li xêretê bê, wê li xesaretê bê
743. kî ne li şêrr e, şêr e
744. kî te tînê sêrê çira
745. kî teşiyê birisê, ewê bêçiyê balêsê
1746. kî xal e, tu heval e
1747. kî zanê çi ji ber gunehê kê ve tê serî mera
1748. kî zanê mala te li ku ye
1749. kiç dara mazî ne
1750. kiçik deriyê hecê ne
1751. kifir dom dike, lê zulim dom nake
1752. kihêl di bin mêrxasan de dibezin
1753. kijan kevrî hilîne, ew di bin da ye
1754. kîjan roja bê, tê wê xewnê bibînê
1755. kîn, kînê dikşînê
1756. kincid te biguviş devî mêr, wê mar pê bimirê
1757. kîngê baranê lêkir, hîngê zivistan e
1758. kir pisiya tûr, rê li pêşê winda kir
1759. kirasê meriya tê gihastin, lê xeyseta meriya nayê guhastin
1760. kirasê mirov diqete, lê eslê mirov naqete
1761. kîrê îro têxe qûna sibê
1762. kîrî wî xeyar e, ya buxwe ya di xwe xe
1763. kirîf û pez; ereb û rez
1764. kirin kirar e,gotin zirar e
1765. kirinek hêjayî hezar gotinan e
1766. kirîv kal dibin, bi ber kara dikin; goçer kal dibin, bi ber ga û golka dikin
1767. kîso avruya masî naxeu
1768. kitêba mirov, piştî mirov tê xwandin
1769. kiyê bixwê, kiyê li xwexê
1770. kopriya vira xerabe ye
1771. kor be, kerr be ji derda dûr be
1772. kor çilo li xwedê dinêre, xwedê jî werê lê dinêre
1773. kor dimire, dibên çav reşê min, keçel dimire dibên por çîlê min
1774. kor herdu çavan dixwaze
1775. kor nehs in, keçel behs in
1776. koro li vir be, min ji te çêtir nedî, ezê li korê xwe vegerim
1777. kose jî li bîra riya ye
1778. koşkar heye çerm tune, çêl heye mast tune
1779. kotek ji cinetê hatine
1780. ku agir bi çiyê ket, ter û hişk tevde dişewitin
1781. ku aqil tinebe, wê porê sipî çibke
1782. ku bext reşbû, kûçkê malê diza venagerîne
1783. ku devê te tiji xwîn be, li pêş kesî tif meke
1784. ku dilê şivan hebe, dikanê ji nêrî şîr bidoşe

785. ku diz bê şevê reş pirin
786. ku hat hê meke, ku çû tê meke
787. ku kela şorbê çû buha yê heskê pera nake
788. ku lawik ji êmlikî nekeve nameşe
789. ku pişta min heba zikê min ne di êşiya
790. ku tu bibî hesp wê swar pirbin
791. ku tu bixwazî teedê li xezana kî, kirasê wan biqetîne
792. ku tu li deriya nexê, derî li te venabin
793. ku tu neke bi ya mezina wê quloçê te bibin wek yê bizina
794. kûçik bê sêxur ti pandiniyê nakin
795. kûçik binêwin, neçêyîk li dû ye
796. kûçik birçî dibin, kûnî hev bîndikin
797. kûçik birçî li ber malê nabe bekcî
798. kûçik goştî kûçka naxwen
799. kûçik her birewin, tu kevrikî bavê yê, kevir namînin
800. kûçik hestiya dixun hesabî kûnê xwe dikin
801. kûçik ji hestiya narevin
802. kûçik ji ku bitirse bi wî alî de direwe
803. kûçik li pişt xudanî xwe î no ye
804. kûçik li ser sergoyê xwe no ye
805. kûçik pîsiyê dixwin ne ji xaşiyê
806. kûçik serî xwe bêşin, geyê dixun
807. kûçik sibehê xewdikin
808. kûçika çiqas biqusîn , nabin tajî
809. kûçika mebin yayla , ê har bibin û bi we bigrin
810. kûçikê me bû, bi lingê me girt
811. kûçikî bezî keviran jê netirse
812. kûçikî bi du deriya xêr tê tineye
813. kûçikî bi kar çêtir e ji şêrî bê kar
814. kûçikî birçî, kî parîk nan pêdê ê li ber qapî wî birewê
815. kûçikî ku tu bi zorê bişînê nêçîrê, ti nêçirê ji te ra nînê
816. kûçikî nizanê birewê mêvana tîne xwe
817. kûçikî tirrok derê kûnî kûçikî fisok bîn dikê
818. kûçikî xerîb dûvî di nav şeqa de ye
819. kuder te bêşê can di wir da ye
820. kuder teniki mila di wir re qulbibê
821. kula aşvan ave
822. kula bûkê xasî ye
823. kulbûn ji korbûnê çêtire
824. kulek xwar e, dû rast e
1825. kumê rasta tim qetyayî ye
1826. kumî elo didê serî welo
1827. kûn bi qujmirandinê teng nabin
1828. kûn lê kir helaw, yan dibên kûn lê bû helaw
1829. kunciyek ji destêd pexîla nakevê
1830. kund çilîka xwe dixwe, paşê bi ser de digrî
1831. kund li qûça vedihewê
1832. kund li ser malekê bixwîne, bê oxir e
1833. kund li ser malekê bixwînê, neçêyîk li pê ye
1834. kûnde bi cih dibin, xizan bi cih nabin
1835. kundir bi xewê mezin dibin
1836. kundir di serî merî fiqare de dişkê
1837. kûnê mera çiqa pîse ji mera nabê
1838. kûnî tirok bi nanî ceheyî mehne ye
1839. kûnid reş û sipî li ber delava xiya dibin
1840. kur darê li pişta bavê ye, qîz warê xeikê ye
1841. kur ji hinave, bira ji bave
1842. kur li bava diçin, qîz li dayîka
1843. kurd ji xelkê re wekî şûrin, û ji xwe re kûrin (korin)
1844. kurê bi dewlet, ji ya bavê xwe der neket
1845. kurê mezin derdê malê, kurê biçûk delalê malê
1846. kurî li felan, xwarzî li xalan
1847. kurmanc refî tuhliya (tîtî) ye, hevdi nagrin
1848. kurmê darê ne ji darê be, zewala darê nayê
1849. kurmî darê ji darê ye
1850. kurrîkî te hebê, tu li şûn wara namînê
1851. kurtik çoxe, nan tine buxwe
1852. kûsî jî dibê dest û lingê min hene
1853. kûsî rindba, xwedê ew ne dixst wî kirasî
1854. kûsî şandin tûq-tixim çû li helwa terpilî, got
1855. kûsiyêd kendala bûn kebaniyêd mala
1856. kûsiyêd kendala xwe didin hember xezala
1857. kuştina kêw çi ye sêrî qut ke û têke xurcê
1858. kutkî mezin hilîne mertê
1859. law darê bavê radike, qîz teşiya dê radike
1860. law jî serîk xelk e û qîz jî serîk xelk e
1861. lawêd me li cem xelkê gulin, û li mal jî bişkulin
1862. lawêd te hebin bi gidiya mekene, keçêd te hebin bi qehpa meken
1863. lawkê min ji cot tê, tevirkê wî çi lêtê, bê dayîk û ne bavo tê

864. lawkê min pir delal e, mêrkar û xwedî mal e, wek şêr û şepal e
865. lawkekî di paş bûkê de li mehînê didin ji bo berwîlî xwe law bê
866. lê kaliyê lê koriyê, mirin çêtir e ji feqîri yê
867. lêniştinê kera carekê şerm e, jêdahatin du cara şerm e
868. lêv ji diranan pêşdetir in
869. lêvek li erdê ye, lêvek li ezmên e
870. lêxistina pir kêr qelp dike
871. leyî her roj kutikan nayne
872. li (ji) xwarinê re nan nabîne, kuma bazar dike
873. li ba dînan tim îd û dewat e
874. li ba gamêşa çêrê ciyekî şînkayî lê heye bibe bi şev da radibin derinê
875. li bejnê nêrî bi zêra kirrî, laçik rakir kertkê gurrî
876. li ber bûka beravêtî neketiye, bi mankera ku cêwî ani ye şa bû ye
877. li ber çavid mişk pisîk bi qas hêştiriki ya
878. li ber defa bê deng direqise
879. li ber fîskê morîka pêvedike
880. li cem kêmaqila her bihar e
881. li cem mêrên êrgan, lêxistinê jinan hêsan e
882. li ciyê nizim, qûç xwe çiya dihesbînin
883. li çayî gewr ker bikevê, li vir qûşê bi stî minkevê
884. li dayîkê binêre qîzê bixaze
885. li dê bimêze keçê bixwaze
886. li deriyê kesî nexe bi tilîka, bila kes li deriyê te nexe bi mîrkuta
887. li dînî xwe bipirse ta heft kes bi tera bibên ma tu dînî
888. li dinyayê mera gî bike, mera vira neke
889. li gor salê tê fesalê
890. li gora makê golik pake
891. li gunda şerid mezin bibin, li mêra mexin, li jina xin
892. li heft gunda mêrkir kesî ew têr ne kir
893. li hemama tirr, li xeribiyê virr
894. li hêştir nîştiye, diqelizê kêrgiyê
895. li kerê nîştî, li kurtên digerê
896. li kerî ketî digerê ku hefsêr jêke
897. li kerî mirî digere ku nala jêke
898. li ku mefa ye, li wir bav û bira ye
899. li kûçik biqewime ji tajî bezotir e
1900. li kuderê dare, ew der war e
1901. li malê tune dînar, navê keçikê hezar
1902. li malî kelepîr digerê ko erzan bikirê
1903. li nav malê şêre, li nav êlê kitika bêkêre
1904. li nav şûvêd reş xew meke, da xewnê xirap nebînî
1905. li paşiyê tim başî hebû ya,wê li paşiya pêz ker tinebûya
1906. li pê bê li tirbê bê
1907. li pêş zimên ne çiya hene ne gelî
1908. li quncî sifra rûmene
1909. li ser rêya helebê bi nalê dipirsê
1910. li welatê koran çavşaş qeral e
1911. li xêrên xelkê be, xêr wê bi xwe werin pêşiya te
1912. lihêmê ji çayî gewr radikê
1913. ling li qeydê, çav li seydê
1914. ling ling digerê, kar kispikî xwe nakê
1915. lingê gerê nayê bin berrê
1916. lingê şimitî heval jêre tineye
1917. lingekî li vir e, lingekî li wir e
1918. lingî xwe bi tayî noka de
1919. lingid kera naçin ser berra
1920. lingid xwe li gor berrê xwe rade
1921. lingid xwe li gor doşekê xwe dirêjke
1922. lingid xwe li lingêd kê bûyî megir
1923. lingid xwe qas orxanê xwe dirêjke
1924. lîtir li navî xwe tê
1925. lûq gewriyê ziç sêrgo
1926. ma dermanê mûmkê ye
1927. ma donî qirkê di xwe dayî
1928. ma emê tûya ji te bixwin
1929. ma ew jî jine, agir berda mala mine
1930. ma ez erebê bavê te me
1931. ma ez li ser sifra bavê te mezin bûme
1932. ma file hemo îşo ne
1933. ma gi ez ne gihêştim te, ezê te jî negînim xwe
1934. ma illem şerî çûka li nav garisî me bibê
1935. ma kêrta hêsinî ye
1936. ma min bîna destê xwe kirî
1937. ma min kefa xwe bêhn kirî ye
1938. ma morîkê diya te li vir qetîne
1939. ma pîka heft sazî ye
1940. ma qey dêka hirçê reqas bû

941. ma qeyne jin çîçekin mera ke di ber serê xwe re ke
942. ma te ava heyatê vxwariye
943. ma te kezebê kêrgiyê xwarî ye
944. ma te mêr guhart, tê bextî xwe jî biguherê
945. ma te nişadir di kûnî xwe dayî tu li cîkî natebitê
946. ma te pirçê min nerm diye
947. ma te rum li kelê xistiye
948. ma ti seriyê kêl di bin kuma de man ( ma tiştî veşartî ma, ma nerindin min û veşartî hene )
949. ma tu berxê misteşêr e
950. ma tu kê tirbê min bi qube hilînê
951. ma ûrê hêştir derbû ye
952. ma virr jî bi kaviran e
953. ma we tif devê hev kirî
954. ma xan bi kirî bû
955. mal bê ard dibin, bûk bê benîşt nabin
956. mal bi camêriyê xera na be
957. mal bi jinê ava dibe
958. mal jî ji cên e
959. mal mala te ye lê bi alî firaxa de mere
960. mal têr e kebanî wekî şêr e, mal birçiye kebanî gazgêncî ye
961. mal vedigere, can venagere
962. mal, aş û bajarin
963. mala bavê min dûrbana, minê têr pesnê wan bidana
964. mala bavê min ne li vire, têr bipesinim ji xwe re
965. mala bê pisîk, mişk tê de pehlewa ne
966. mala fatê çû cem bazarê
967. mala me li ço yê me ye, ço yê me li ser mila me ye
968. mala melê zave tirşeqîn ketî nave
969. mala mêr tê de kaniya zêr tê de
970. mala meriv him cineta meriv e û him cehnima meriv e
971. mala mezin her ro min digezin, mala çûk her ro min dikin bûk
972. mala nan dayî tinebûnê nabîne
973. mala pir jin tê de xerabû ji bin de
974. mala zarok tê de, ehremen naçe têde
975. malê camêrkî û xesîskî wek hev derê
976. malê dinê qloçê mêran e
1977. malê dinyê gemara destî canik û camêra ye
1978. malê heram, malê helal bi xwe re dibe
1979. malê kund lê xwend, ew mala xera dibe
1980. malê malnexwaran behra zordara ye
1981. malê miriyan ê zindiya ye
1982. malê ne ji lawî çê ra bike, û ne ji lawî xirap re
1983. malê qûn divê, girarê rûn divê
1984. malê te hebe, her kes dostê te ye
1985. malê tenbela berî malê zalima xira dibê
1986. malê xsîs, diçe fetîs
1987. malê xwe bide, seriyê xwe meşkîne
1988. malê zaf bê heram nabe, xeberdana zaf bê virr nabe
1989. malek ku yekdest bê, gundek pê nikanê, gundek yekdest bê, êlek pê nikanê
1990. malî camêra li meydanê ye
1991. malî dinê serî xwe buxwê
1992. malî pexîla rizqê camêra ye
1993. malî zengîna bela serê fuqarane
1994. malid şêra bê hestî nabin
1995. malxirakirin careke
1996. mamanê li xwe bi gûmanê
1997. mamo ne li mal e, mala mamo gale gal e
1998. manê tirekan ardê cehîn e
1999. mange ne bi ga bê boxe bi dû nakevin
2000. mar biçûke, serî jêke
2001. mar çêba dest û pê nediketin zik
2002. mar çiqa hokan bide xwe, gereke rast here qula xwe
2003. mar dûvî xwe yî qut ji bîr nake, pîr nalnalê lawî xwe ji bîr nake
2004. mar ji pûngê xêliye, li ber qulê şîn tê
2005. mar nakevin paşila
2006. marê ku mar e, di ser avê de bi meriyan venade
2007. marek di hewşê kesî kevê, avinê avsîn kin û bi hewşê reşînin wê mar ji hewşê bazdê
2008. margestî ji werîs ditirse
2009. marî kor avsînê nagrê
2010. marî kor bi kê dadê, ji siyê naghê ber royê
2011. masî di sêri da digemire
2012. mast taştiya rast, dew taştiya derew
2013. mastê kîs nabe rîs
2014. mastî kûçik biçelpînê jêre dimînê
2015. mastî rind bikeyê da nîvişk vêkevê

016. me bi xwe rovî bir nav rezê xwe
017. me çi got û tembûrê çi got
018. me ew xwedî kirin di dawa xwe de, destên xwe avêtin rêyên me
019. me girt tajî, derket tol tajî
020. me hêştir nedîne li rêzê, qey me pişkul jî nedîne li pirêzê
021. me li pişt xwe li kerê kir, dest avêt e xurcê
022. mê ye û dixwazê mêraniye bikê
023. mebe hevalê leng a, nabîsî deng a
024. mede yan mera jîr dikin, yan jî mera kor dikin
025. megere li newala, da nebînî xeyala
026. meken bi deriya zû tê seriya
027. mekene li jar û bendewaran bikene li ser bizêr û kofîxwaran
028. mekev, mekev, kesî ketiya tuneye
029. melê bihna xwarinê kir, quran ji bîrkir
030. meqes sed carî meqes
031. mêr bê xwedî bin, jar dibin; jin bê xwedî bin har dibin
032. mêr bi nanekê nabin nandar, û bi darekî nabin navdar
033. mêr bi te dada, şîr vexwe
034. mêr çol e, jin gol e
035. mêr dimire dil namire, ker dimre kîr namire
036. mêr dimirê jin hardibê, jin dimirê mêr jar dibê
037. mêr gula malan e û jin derdê mêran e
038. mêr hene û mêrik hene, jin hene, û jinik hene
039. mêr hene, mêrik hene
040. mêr jî hene, mêrkok jî hene; jin jî hene, jinkok jî hene
041. mêr ji jinên zana nefret dikin
042. mêr ji şerma xwe têne kuştin
043. mêr ji şerma xwe têne kuştin, jin ji bê şermi yê
044. mêr jina dikin jin jî û dikin darqûn jî
045. mêr ketin kewara, jin çûn hewara
046. mêr lêmişt in, jin jî gol in
047. mêr mêr gotine, jin jin gotine
048. mêr mêran nas dikin, jin camêra şaş dikin
049. mêr tev mêr be, jin tev jin be, kî mihtacê kê be
050. mêr ya mêrxasbe ya bimire ji xwe xelasbe
2051. mera aşî wê de nebîne, aşî vir de bi mera şêrîn nabe
2052. mera bi lê da çû, merayê destî xwe çekê çi bûye
2053. mera carekê tê dunyê
2054. mera dişînê diziyê û li mera didê firîziyê
2055. mera dostî xwe di tengiya de nas dikê
2056. mera guh nede mezinê xwe, mera timî poşmane
2057. mera ji bava de sêwî nabe, lê mera ji dêkan de sêwî dibe
2058. mera ji biroşê xwe têr nexwê, mera ji broşê xelkê têr nabe
2059. mera kanê nanî xelkê bi zorê bixuê, lê mera nikanê nanî xwe bi zorê bi xelkê dê
2060. mera kê rezîl bibê, mila malî mera rezîl bibê
2061. mera ku nemir, royên xweş mera yê bibîne
2062. mera li malê xwe sixêfa dikê pêdişê jî
2063. mêra mêr dikuştin, ceboriya hûr dişûştin
2064. mêra mêr kuşt, senemê hûrî şuşt
2065. mera ne kanê li pêşê te herê ne li paşî te herê
2066. mera nikanê ji ber kerasî xwe ve sûnd bixwe
2067. mera şorê temam anca kera re hewaldê
2068. mera xwe bi destî xwe nexurîne xurê mera naşke
2069. mera zanibe mera kê kengî bimrê, mera yê tirbak xwe pêşda bikolê
2070. merakê çêrrê mêvana bibe, bibê jinê mila şîv hazir be
2071. mêranî ne bi badanê simbêla ye
2072. merantî ( merivantî ) çiqasî tehle waqasî şêrîne
2073. mêrê baş mîr e, û mêrê xirab esîr e
2074. mêrê baş nanêre ne li pêş û ne li paş
2075. mêrê çê bi gundekî, merê xirab bi kundekî
2076. mêrê çê di roja teng de fêm dibe
2077. mêrê ehmeq dibê
2078. mêrê fedok bi kundekî, jina fedok bi gundekî
2079. mêrê mêr li her dera mêre
2080. mêrê mêr, bê dost û dujmin nabê
2081. mêrê mêr, di bin mineta xelkê de namîne
2082. mêrê newêrek sînga gewr nabîne
2083. mere rêk û pesarêd kaş, da nebînê xewnêd şaş

084. mêrê xeberjin, berxê ber bizin, şûva bi kizin, ti tişt jê dernayê
085. mêrê xezan dijminên xwe ji malê ne
086. merhemeta ne li ci, merezê tîne
087. merî bezî kevrî mezin ne yê şerra ye
088. merî bi xwe bikevê nêşê
089. merî çê bi xwarnê xerab qayil nabê
090. merî çiqas zane be, dîsa nezan e
091. merî dîn tim zarok e, gayî dîn tim golik e, jinê dîn tim keçik e
092. merî diz be, şevreş pir in
093. merî goza ( giwîz )xwe çit nebîne, kevrê xwe navêje yê
094. merî goza ( giwîz )xwe neçel nebêne, çelakê xwe navêjê yê
095. merî har wê bi ser kêrê xu da bikevê
096. merî heye dewletî ye, merî jî heye dewlet diye
097. merî ji guran bitirse, nikare pêz xwedî ke
098. merî ji kera pir in, sibek lê venehata, dûv û guh jî wê vêketana
099. merî mêr di gêçûtid teng da bêli dibin
100. merî qantirê qantirciya netirsîne, merî holika naxwe
101. merî xayîn temenî xwe kin e
102. merî xerîb î kor e
103. merî xwe li dera vena ê xwe bi ber ziraradê
104. mêrik gihîşt nav zeviyê xwe dît ko mêvên ga dizîne
105. mêrik rûniştiye, ne li neha ye, ne li deha ye
106. meriv bi hev ra got baş e, xelk wê bêjê paş e
107. meriv bi şorekê cinetî dibê, bi şorekê jî cehnimî dibê
108. meriv li mecbûrî bi yarê jinê xwe ra nan dixwê
109. meriv xwînê bi xwînê naşo, meriv xwînê bi avê dişo
110. meriyê bê guman, bê ol û bê îman
111. meriyê bê welat, teyrê bê perr û bask e
112. meriyê bi ar, ( bi avrû bi şeref ) şorek jê re bar
113. meriyê dewletî siyar dibe xwedê bîr dike, peya dibe hespê bîr dike
114. meriyê koçerî, jê dûr e rencberî
115. meriyê ku nanê xwe erzan be, ewî buha be
116. meriyê virrek para xwe serîn e
117. meriyid mera zêrid veşartî ne
2118. mêrkê êzdî bi simbêla tê naskirin
2119. merr emaret e, cot şoret e
2120. merre merrê, tu çûyê jî bi rûn û dimis herrê
2121. mêrxwasî şana wê dehin, yek jê zore neh jî fenin
2122. mêş çiqasî biçûke mehdî mera li hev dixe
2123. mêş û gamêş, xwedî tînin pêş ؟
2124. mêş zane ko wê ji kîjan gulê hingiv hilîne
2125. mêşek li rûya binê wê bi hezar perçebe
2126. mêvan berxê mezûvan e
2127. mêvan bi nan û ava xwe tê
2128. mêvan ger ji mêvên hezneke, xwediyê malê wê ji herdiya hezneke
2129. mêvan ji mêvên sil bû xwediyê malê ji herduwa sil bû
2130. mêvan mêvanê xwedê ne
2131. mêvan roviye têr xwar dibe şêr
2132. mêvanê bê wext, ji kîsî xwe dixwe
2133. meydan fetre ye tirr bê pere ye
2134. mezbût bikole asas, ji bo dil neke wase was
2135. mezin avê dirijînin zarok pa dixuşînin
2136. mezin bibin ker jî, ger tu lê swarbû linga lê mekut
2137. mezin li mal tinebin, piştê bi kevrekîde
2138. mezin nefeqine, lê îş bi sêri hatine
2139. mezin reqisî, biçûk hewisî
2140. mezinbûn û çûkbûnê gunda di teng û ferebûnê rêkê ra xuya dike
2141. mî bi lingê xwe bizin bi lingê xwe her yek derê ber singê xwe
2142. mî bi ser berxê xwe de dikale
2143. mî biha bê erzan bê, ne xema gur e
2144. mih bi nigê xwe û bizin bi nigê xwe
2145. mij xwe li çiyayid bilind digre
2146. mila barê xwedê bê, ne yê qûl bê
2147. mila bîr bi av bê, mila kûr bê, mila rê bê mila dûr bê
2148. mila dilî bi dil bê, mila doşek erd bê, orxan ezman bê, balgi kevir bê
2149. mila dilî bi dilbê tûrî parsê li mil bê
2150. mila eyarî te ferebê
2151. mila ji malê gurzê be, bira sîpa kerê be
2152. mila mal bê, ne can bê
2153. mila mêr bê li nav malê bê, bila komik hestî bê
2154. mila mirov mêr bê, mila rojekê li dinê bê

155. mila rê ya rast be mila dûr be
156. mila rindik bê mila çîlik bê mila qîza kûçik bê
157. mila tim kum li serî te ferebê
158. mila zarok kûnê te bibînî, surê te nebînin
159. min bi çirî çava kom kir,te bi comerdî bela kir
160. min bûk anî bi lez û bez, sivika malê dîsa mam ez
161. min bûk anî ji hevîda serbinê xwe tev tê da, hîn nizanî kûfiya xwe girêda
162. min bûkek anî bi lez û bez, min têda rez û pez, sivika malê dîsa mam ez
163. min bûkek anî ji hezo, min tê da mal û pezo, sivika malê ma ezo
164. min da hewş û pelaş, min anî bûkek tor û belaş
165. min dey nekir, te fey nekir
166. min dile, te dile, xelkê çi derd û kule
167. min guloka xwe jê zî
168. min rist teşî û dagirt tevn, ahîna min axîna min yarê min î kevin
169. min şande behîva mir, ma ji vî va
170. min û te dile, xelkê çi dil ji me yî bi kul e
171. min û wê dile, wan çi kul e
172. min xelk hînî govendê kir, êdî kesî bi destê min negirt
173. minê minê derê nav ciyê jinê
174. minê-minê mirov naçe nivîna jinê
175. mirazê bê dil, wek caniya bê hefsar û bê cil
176. mirazê bê dil, wek kirasê bê mil
177. miri bi xêr bê, feqi bi xwe tê
178. mirî dimre qûnzêrî dibe
179. mirî ne rûreş bê gor lê tengnabê
180. mirin çêtire ji feqîriyê
181. mirin hespê boz e li ber derê hemo kesa ye
182. mirin yek e, lê mihane gelek in
183. mirin yek i, sebeb pirin
184. mirina dewlemendan ji bo melayan mizgîn e, mirina xizanan şîn e
185. mirina pisîkê tê, dere hîzê pîreka dixwe
186. mirinê bi hev ra îd û dewat e
187. mirinê bizinê werê, derê nanî şivên dixwê
188. mirinê kûçka tê, bi dîwarî camiyê da dimîzin
189. mirîşk avê vedixin, li hafê xwe dinirin
190. mirîşk biqare, hêkê dike
2191. mirîşk birçî dibin, gêris di xewnê de dibînin
2192. mirîşk hene li ciyekî dikin qid-qid li ciyekî hêka dikin
2193. mirîşk û kelmêş û mêş in, leşkerê bê teftêş in hergî te go kiş dihatin pêşin
2194. mirîşk û rovî danaynin kirîvî
2195. mirîşka zer e, hêka bi zorê ji xwe dike dere
2196. mirîşka zer e, xwê û sabûa min li ser e
2197. mirîşkê çav li betê kir, qûn li xwe dirrand
2198. mirîşkê kor di xewnê da dikefe embarê gênim
2199. mirîşkê kor di xewnêda dikeve nav komê gênim û gêris
2200. mirîşkê nu hatin hêkê hesinî kirin
2201. mirîşkê pir gerî, ê gû bi lingî xwe re wîne
2202. mirîşkê te hêk di pînkê xelkê da kirin, wer zanibe dolabê te î ters dizîvirê
2203. mirîşkî kor ji dîkî kor ra ye
2204. miriya çiqas misde, ewqas ba bi ber dikevê
2205. miriyo qedayo, saxo belayo
2206. mirov barê xwe hilnegire, kes jê re hilnagire
2207. mirov bi hevalid xwe tê nas kirin
2208. mirov bi paşatiyê nabe mirov
2209. mirov carekê dimirê
2210. mirov çawa dizîvire bila bizîvire, her qûn li paş dimîne
2211. mirov çiqas zanabe, ewqas dilnizim dibe
2212. mirov di nav miletê xwe de şêx e
2213. mirov dimire, lê deyn namire
2214. mirov gotina nîvcî ji kera re dibêje
2215. mirov here goristanê, ko gora mirov tê de hebe
2216. mirov hingî mûyekê ji beraz hilbike xêr e
2217. mirov ji qehran, xwe davê behran
2218. mirov karwanê mêwîja diket belê karwanê befrê naket
2219. mirov ne xwediyê dilê xwe ye
2220. mirov nekeve avê sobehiyê hîn nabe
2221. mirov piçik piçik diçe ber kuçik
2222. mirovê bi hevotina jinê, li sira mirinê
2223. mirovê lal, jê meke sewal e deyn
2224. mirovê mirov, carekê dixope
2225. mirovê şît bi dilê pît
2226. mirovek navî gundekî pîs dikê
2227. mirovekî rovê xwe kurdikir mêşek hingiv hat li ser kîr nîşt, mêrik go

228. mirovên bê dost û bê dijmin, ne di rêza mirovan da ye
229. mişk di quncke, dibe şêr
230. miya bi tenê qismeta gur e
231. miya kol li histiriya geriya, ji guhê xwe bû
232. miya xerîb li rexa kerî mexel tê
233. mîza hêştir e, her dere, bi şûn de dere
234. mîza wî tê, jê werê kîrê wî rabû
235. morîka qul li erdê namînê
236. mû bi zimanê min ve hat, û pere ne kir
237. mûkî di bin zimanî te da heye
238. mûkî di vî îşî de heye
239. mûkî ji wêhş jêke kare
240. mûyek mûyek, dibe tejek
241. namûs avêtin ber kûçkan, kûçka ranekir
242. namûs ne bi peran e
243. namûsê neke perde ya malê dinê
244. nan bide nanpêj, nanekê jî zêde bidê
245. nan buxwe parî parî, şorbê buxwe heta tu karî
246. nan dişkê dibê du kerî, werîs diqetê dibê çar serî
247. nan ji hebana tirr li ezmana
248. nan ji hemiya ra, xeml ji hina ra
249. nan parî-parî, girar heya tu karî
250. nan û pîvaz hebe nexwaşî çavreşi ye
251. nandayî birçî namîne
252. nanê bibe kerî, hev nagire
253. nanê mêran li ser mêran deyn e
254. nanê tîrê, xwaş hevîrê
255. nanek û zerkek dew ne ti tişt e lê ne karê her kesi ye
256. nanek û zerkek dew ne tiştek e, lê ji pençê herkesî dernakevê
257. nanek, nanek, derê arvanek
258. nanî genimî bi des mi ne ket, nanî ceyî kûnê min maçdike
259. nanî genimî bi dest min ne ket, nanî cehî destî min maç dike
260. nanî genimî di zikî her kesî de nasekinê
261. nanî mera hevalê mera ye
262. nanî mera yî tisî ji pelawê xelkê çêtire
263. nanî xwe meke tûrî hevala û bi minet mexe
264. nanik xwe kêm bixwe, azepikî xwe ragire
265. nankoran bidiyê mediyê yek e
266. nava du dînan de zincîr diqete, nava du jîran de mû naqete
2267. navê gur derketiye, rovî dinyê xera dike
2268. navê jinê dînanok, mal de tune arvanok
2269. navê te ket kutkê istenbûlê
2270. navê wê edlan e, ji mêrê xwe re nezan e, ji xelkê re kevaniya bîst û heft salan e
2271. navekî şêr heye, lê rûvî dinê xera kiri ye
2272. navik mezin li gundek kavil
2273. navmalî salê carekê bigorîne, şivanê xwe bêhlîne
2274. naxir bermal bû, kebaniya xerab li mal betal bû
2275. ne bar ket, ne toz rabû
2276. ne beran gêr bike, ne berxan kêr bike
2277. ne bi çêyi ne bi xerapi sûnd mexe
2278. ne bi lezê, ne bi bezê, kes nagihêjê tu mirazî
2279. ne biçûkê bira be, çêlkê ber devê gura be
2280. ne bist bişewite û ne kebab
2281. ne cina bibîne, ne qulwela bixwîne
2282. ne çixara ber bê, ne kutana nav kayê
2283. ne di dil diborê, ne di gurçikê diborê
2284. ne di dîna ne, ne jî qûna xwe bide dîna
2285. ne dikene ku em vê re bikenin, ne digrî ku em vê re bigrîn
2286. ne dîndinê êreb û ne xwarinê xurma û şîrî devê
2287. ne distirê ne tewdikê
2288. ne dîtinê êreb, û ne şîrî hêştir
2289. ne dîtinê gur û ne jî oxirê gur
2290. ne dujminê xerapa bin, dujminê xerapi yê bin
2291. ne ew hêka bê, ne jî ew qidqida bê
2292. ne feqîrê bi tirr, ne zengînê diz
2293. ne firre bi malê dinê, bifirre bi feyza dinê
2294. ne ga ye, ne za ye
2295. ne gundê bê rez, ne konê bê pez, ne mêrê bibêje, ez û ez
2296. ne hêja me tenak genim, û bi teva dikenim
2297. ne hêja ye tiştekî, deng dike li ser her kesekî
2298. ne her tiştî tê baxşandin, tê ji bîrkirin
2299. ne hîz e bidirrê, ne kûz e bişkê
2300. ne ji defê re dibê, ne ji zurnê re dibê
2301. ne ji dil dibe, ne ji kezebê dibe
2302. ne ji gelaca ba wê gur û mî bi hera bigeryana
2303. ne ji gelacan bê, rovî wê li çarşiyan bigerê

304. ne ji tirsê bê, wê her kesek xwedêkî xwe ji heriyê çêkê
305. ne jina bi bergera, û ne qiçkê bi berbejna k feyz
306. ne jina bi devgirêdana, ne lawê ben û nivişta
307. ne jina bi pirç, ne mêrê kose
308. ne jina parî rind, ne mêvanê mal li gund, ne xizanê pozbilind
309. ne jinê kenok, ne mêrî tirsok
310. ne karî jina, ne cotî çêla
311. ne kerê zirzirî, ne ewrê girgirî, ne mêrê tirtirî
312. ne kes bi dua dibît, ne kes bi nifrîna dimrît
313. ne li mala min e nizanê bi halê min e
314. ne li nav tirban xewke, ne jî xewnid kirêt bibîne
315. ne li newalên kûr razê, ne xewnên xirap bibîne
316. ne malê pirr, ne gerdena stûr
317. ne mêr heye bukujê, ne qiçik heye bimijê
318. ne mêrê rût ne jina bi pirmût
319. ne nanê wan dixwim, ne defa wan lê dixwim
320. ne nên pêde, ne mîkuta lêde
321. ne pêde, ne bi rû de
322. ne sar li te tê ne germ li te tê
323. ne şêrînbe ku xelk te buxwe, ne jî tehlbe ku xelk te bavêje
324. ne şorid ber ara, ne rindid ber çira
325. ne xebitiye, para herî mezin ji xwe re hiştiye
326. ne xema wê ye û ne dema wê ye, çirqe çirqa benîştê wê ye
327. ne xwar, ne da hevala, genî kir avêt newala
328. ne za di malê da, ne ka di kadînê da, ne xem di dil da
329. nebalixa benîştî xwe pûç nabin
330. nebe cilkê pê cercerê
331. nebe destikî kêra
332. nebêje, te got bike
333. neçe cineta bi minet
334. neçe şerê xal û xuharziyan, neke hewar û gaziyan
335. nêçîrvan nêçîra xwe nasdike
336. nedî,,nedî,,quzê ca xwe dî
337. nefela çarpelî nîşana xêr û bêrê ye
2338. nefsa xwe birrî, zarokê xwe kirrî
2339. nehan nedî dehan naxwî
2340. neke bi kesan, wê bê serê te, ku neyê serê te, wê bê serê pisê pisan
2341. neke dengî dilê dujminî peqand
2342. nên bixwe bi qinyat, jina bixwaz ji derê bi kok û binyat
2343. nênûk tine xwe pê bixurîne
2344. nênûk û goşt ji hev naqetin
2345. nênûkid te bi ser goşt kevin debar li te nabê
2346. nerê aşî paşin, aşî pêşin pê şêrîn nabê
2347. nêrî nemînin dibêjin gîskan belo belo
2348. nerindi ya meke, ji te ra ma ji qiçkid te re namînê
2349. nêrînek çavan, biharek dilan
2350. nêtê dil qeda sêri ye
2351. nevîkî minî tikî bi tenê hebû bi navê jiyan
2352. nexwaş e, parî xweş e
2353. nexwaşa neşîne hinaran
2354. neyar bi rewşa neyar nizane
2355. neyîn ji kêvir hişktir e
2356. nêzamiryo, te cilmiriyê me nedî
2357. nezan e, rê ya malê nizane
2358. nezan î, mal bistîne bi cwan î
2359. nifir diçin asîmana, vedigerin xwedana
2360. nifirid dê û bavê li ewlada nakevin
2361. nikilî kêw sor ne kir, gule mavêjê
2362. nimre ( ) wek perçemkê de hatî rave kirin )
2363. nîrê pîşê kêrgiyê ye
2364. nîrek narê gepirê
2365. nîrek narê gepirê, bi alî karada jî narê
2366. nîskê navên dewsa kizinê, berxê navên ber bizinê, malê nebin cem mala bavê jinê
2367. nîskê ne zik e, ne pişt e
2368. niştiman bi çekan tê vegirtin, û bi çekan tê standin
2369. nîvê serxwebûnê gurrintîne ( guriltî )
2370. nîvmeleyan dîn winda kir, nîvhekîman can winda kir
2371. nîvxoce mera ji dîn dikin, nîvtuxtir mera ji cên dikin
2372. nizanê bireqisê dibê erd xwar e
2373. nizanê hefteka kê ye, kefçiyan kom dikê,
2374. nizanê kî mirî, gulyêd xwe dibirrî
2375. noginên me helahela têra parronên me bikin

376. nokê gotî
377. nokê, giya rabû li ser kokê
378. oranê her tiştî heye
379. ordekê ordekê hildave bendekê, da em herin nimêja kotekê
380. ot otê xwe dibîne, ga cotê xwe dikşîne
381. palê xerap das û tarê diguhêre
382. para xeydoka, çû ber ecacoka
383. pariyê ko naçe qirka te mexe devê xwe
384. pariyê ko nikanibî daqirtînî meke devê xwe
385. pariyê xwe ket rûn
386. pariyê zêde gewriyê naqelêş e
387. pariyekî xweş hêja ye gayekî reş
388. pars di gişî de dibe, di hezkirinê de nabe
389. pars ji parsekeran nabe؟
390. paxir zer e, lê ne zêr e
391. pê ji bo rê, sîng ji bo sebrê
392. pêçiya neçe qulê, tişt pêve nabe
393. pêçiyid desta giştik ne yekin
394. pelên mayî ji ên bihurtî çêtirin
395. pelgê sîran, didin pîran
396. pel-pel dinêre û dengî xwe nake
397. pênûs ji şûr bi hêztir e
398. pera di kurtanî kerêke, ker jî wê bizire
399. pere destî dê û qîzê ji hev dikê
400. pere gemarê destan e
401. pere meriyan dibin ciyid fere
402. perê pir dijminê mera ne
403. pere pûştin bi meriyan re namînin
404. perê te hebin, kes nabê tu lawê kê ye
405. pere tên ser pera
406. perên helal ji bo rojên tengin
407. perspan li ser perspên nakeve
408. perspanid reş û sipî li hev natên
409. pesin daye, ji waran maye
410. pêşî bifkire paşê bike
411. pêşiyê av paşê avahî
412. pêşiyê diçe dibêjin pîj e, pey diçe dbêjin gêje
413. petîxa zer tim ji kosiya re ye
414. pêwr û mizînê ji ser hev nakê der
415. pêyadanê heft sêmsora bi pêyadanê marekî ye
416. peyê devrûtê sibê dereng derê êvarê zû tê
417. pezê bê şivan gur dixwe
418. pezê bi tenê guran xwariye
2419. pezê goşt malê kêrê ye
2420. pezê kûvî ji kevirî nahête xarê, ille bi tivingê
2421. pîjik li pêçî te hatin der gustêlkek tûcî di pêçî xwe ke nema pîjik derdikevin
2422. pîr bi desmêj e, sal dirêj e
2423. pir gotin, ceger sotin
2424. pir here hindik here ê wê xwenê bibîne
2425. pir herê, hindik herê, tê bimirê
2426. pir heywan goşt dixwin, lê navî gur derketî
2427. pîr im, ji xweşi yê dûr im
2428. piranî mêrani yê winda dike
2429. pirani yê mêranî danî
2430. pirbûn ji hindikahi yê çê dibe
2431. pirbûna mêra mêranti yê xera dike
2432. pirçê gunka ne dibe tevn ne dibe teşi
2433. pîrê bahwer ne kir mêr bike, mêr kir dawa next û hefteka kir
2434. pîrê bawer ne kir ku mêr bike, gava mêr kir dawa heftan, heyştan kir
2435. pîrê têr bû, paşê ga hat bîrê
2436. pîrê tirr kirî ye û pîr ne razî ye
2437. pirêze yî bi sape, xidir î bi ape
2438. pirs bi pirs mera dighê mala xudê
2439. pirsa xwe bibêje, paşê birêje
2440. pirsan bike ji xortên geryayî û ji kalên zemanan
2441. pirskirin ne şerm e, li ser nezaniyê bimînê şerm e
2442. pirskirin ne şerm e, nezanî şerm e
2443. pirskirin ne şerm e, nezanî şerm e û ger nizani bê ku nezanî
2444. pîs nebê, pak jî nabê
2445. pisîk kal bûn bûne tirqiyê mişkan
2446. pisîk serê sibê avdaskê, wê rojê mêvanê wê malê wê bên
2447. pisîka bi esil, mirarê xwe nîşan nade
2448. pîsing ne li mal be daweta mişkan e
2449. pismam bû ker, dotmam da der
2450. pismamo kero, sepeta kayê li bero, te ez dam dero
2451. piştî çax û wexta xwe guharek xistî guhê xwe
2452. piştî heft yara bû bûk
2453. piştî hft zarokan çava kildidê
2454. piştî tengasi yê ferehi ye
2455. piştî tirr kir kûn qurmiçand

456. piştî tirrê kezî kurrê
457. piştî tirrê qurmiçandin fayde nake
458. pîvaz pîvaz e çi sor çi sipî
459. pîvazê serê sibê tu buxe, nîvro bi dostî xwe de, îvarê bi dijminî xwe de
460. pola ji pola nagre
461. porhinc kete qunc
462. postê devê, barê gê ye
463. poşmaniya paşin ber tiştî nagire
464. pozê jinekê dibirrîn, wê jî digot
465. pozî gîsnî cotajotinê vedibrûsê
466. qam ji qama kermêşê, deng ji dengê gamêşê
467. qantir bi şev û roj didê serhev ku wê çawa xwedanî xwe bikujê
468. qantir bizê, wê dunya xera bibê
469. qantir nazê, xwê şîn nabê
470. qantirê bazirgancî metirsîne, tu ti zirarê nabîne
471. qantirê çamûş pêş ve herê gez dike paş ve herê yê hildide zîta
472. qantirê çamûş pêş ve herê geza davê, paş ve herê yê pehna davê
473. qantirê qêdî metirsîne, tu zirarê nabîne
474. qaz bi refa xwe re baz e
475. qaz wekî dizane, ba wekî xwe
476. qaz zengilê devî deriya ne
477. qaza bi lingekî xeber da gundekî
478. qaza bi lingikî rojê li ser singikî
479. qazik ji xwe re bi tewkê dikene
480. qazik tenê zane çito bini dişewite
481. qedê were dana şîr ketiye guhana
482. qedrê mêvana qedrê xwedê
483. qedrê porsipiya zanibin
484. qehpik bi gidiya disekinin
485. qehra hêştir e, çira ji kerê paştire
486. qencî nayê ji bîrkirin
487. qencî qenciyê nas dike
488. qenciya ne li cih, bela ye
489. qereçiya welatê xwe, nadim bi xatûna welatê xelkê
490. qerqerê mirî cawê sipiye, lê xelasiya wî emelê wîye
491. qertel sibê şiyar dibin stûyê wan bi kuda li yan ketibê bi wî piyî de difirin
492. qey hêlana êreb e
493. qey mirov qawîn e, ku me ra kûnê bîn kê
2494. qiçik bifirin jî bawerke, bizirin jî bawerke
2495. qiçik li ser tirbê xwe dilîzin
2496. qiçik mera dişînin qapî dujmina jî
2497. qijakê xwast meşa werdekê hînbe, meşa werdekê hîn nebû, cotkê xwe jî ji bîrkir
2498. qird belaş dîlanê nake
2499. qird di çavê dê de xezal e
2500. qîretê cîrên a cîrên e
2501. qirrka bavê xwe yî gemarî nedîta, xwedê zane, wê bigota ez lawê kê me
2502. qisa mala bavêjin çala
2503. qîz sor in, xort kor in
2504. qîz, çira xelkê vêdixin
2505. qîza baş be, li pey kaş be
2506. qîza cînar cînar dide mêr
2507. qîzanî xweş e, bûkanî gula geş e, gava ku kete ber qehra malan roja reş e
2508. qîzek xwe anî pîr bû , bûkek xwe anî jîr bû, hewîk xwe anî xedar bû
2509. qoçê kera çênabin, dibên qey em tim dehşin
2510. qûçid bilind qelawîza naxwazin
2511. qûl li ber yek xwe ye, xwedê li ber yek xwe ye
2512. qûl tevdîra dikê, xwedê tedbîra dikê
2513. qumciyî rind ji ciyî xwe der nakevê
2514. qûn bi qûnkaşkê ji kîr xelas nabe
2515. qûn ji qentarekê gereke ku li ser weqiyek zêr rûne
2516. quncikêd pixara germ in, şor tê de xweş û nerm in
2517. quriş tim çêl pere ye
2518. qurnas digerin du cara, êvarî tên li mala xwe dixun
2519. quruşekî di berîkê te da çêtir e ji zêrî di berîkê xelkê da
2520. quruşî xirap li xwedana vedigerê
2521. quzê gewr di derpê re xwyanê ye
2522. quzê par rewisî, îsal bîhn dide
2523. rakirina zulmê ji zalimdara nexwazin
2524. rast fisê dîk ne tişt e, wekî dinê li xweşiyê mirîşkê tê
2525. raste şêx e, lê di dilê xwe de rêx e
2526. rastî şûrê xwedê ye
2527. rastî tehl e
2528. rastî tehle lê gereke tu bêjê
2529. rastî xelasiye

530. rastiyê heft diram zêhêr têdane
531. rastiyê vemeşêr, û mebê
532. rasto bi rastî, xwaro darê şikestî
533. rasto duristo, xwearo şikesto
534. rê rêya mirinê jî be, tu her li pêşbe
535. rebeno tim be te rûyê xwe reş kir, rabe li ser kab û nîvê
536. rêç rêça kera çûne, sûc sûcê bûkê nûn e
537. rehmek li rû, tirek li dû
538. rêncber û maldar, nabin hem war
539. rêncberê xwe be, axayê mala xelkê be
540. reng da der kesk û spî sor û zer, kesk aştî, sor hêza yezdan, sipî roj e, rûmet e zer
541. reng rengin, lê sor bi dengin
542. reş bi reş kenî, beş çû li newala tewş kenî
543. reşê dê û bavê, sipî nabe, bi sabûnê û avê
544. reşê, bermalê, gewrê, berkendalê
545. reşo tu û destêt xwe eger avê tu ne birî
546. revê pisîkan bin qulînê ye
547. rewşa konan çît û perde ne
548. rewşa malê kebaniye
549. rewşa qîza kezî ne
550. rewşa qîzan bisk û kezî yên wan e
551. rewşa zivistanê berf e
552. rêya dirêj ji gava biçûk dest pêdike
553. rêya malê malxwe zanê
554. rêya seg di ber qesab deyî
555. rez kor dibin, simaq li şûnê şîn tên
556. rez û pez û zêr e, dara biçîn hîn bi xêr e
557. rezîlî rabû kabê
558. rî-berdan a qolayî ye, rî-qutkirin a çetin e
559. rih kurkirin, paşê neynik dîna ber xwe
560. rim di tûr hilnayê
561. rindid gunda, vê nav û notik nabin
562. rindid mera tine bin, id xelkê pera nakin
563. rindiyê bike, bi avê de berde
564. rindiyê ji bîr meke, li nerindiyê sêr meke
565. riya azadiyê, bi xwîna şehîda rohnî dibe
566. riya dirêj bi gava destpêkê dest pê dike
567. rizqî cixarê pir e
568. rizqî gur li şivanî bê xêr e
569. rizqî mêvana vê ra tê
570. rizqî sa li ser dîna ye
571. rizqî siba li siba ye
572. ro bi sêwî ya ket, mal heft cara ji dest barkirin

2573. ro di pişt ça de namîne
2574. ro hilat mirna pêlî hat, roj çû ava palî bû zava
2575. ro li kî derê li te çû ava, li wê derê jî bisekine
2576. ro reş bû, xwe ji royê reştir bike
2577. roj bi seradê nayê veşartin
2578. roj derin, qeza narin
2579. roj diçê bela naçe
2580. roj gazekê bi banî ket, cotkarê min nûka bi rê ket
2581. roj tê, yê dikene digrî, yê digrî dikene
2582. rojan nikanê dostekî bibînê, rojekê kanê deh dostan bixeydînê
2583. rojê sibê nedê mera, rojê berava vala ye
2584. rojên xwedê ji garisê sorik pirtir in
2585. roniya çava deyaqa dila
2586. rovî ber derê kuna xwe şêre
2587. rovî di şiketê kefin zarok ê bi dêri kefin
2588. rovî du cara nakeve xefkê
2589. rovî li ber qapî xwe şêre
2590. rovîkî berdayî, çêtire ji şêrekî giradayî
2591. rovîkî digerê ji şêrekî xewkirî çêtir e
2592. rovîkî gerok çêtire, ji şêrekî mexelok
2593. roviyê gerok ji şêrê raketî çêtir e
2594. roviyê zexel, bi herdu nigan dikve dafikê
2595. royê çê ji sibêda xiya ye
2596. royê dere venagere
2597. rû ji rûya şerm dikin
2598. rum di çiwala da natên veşartin
2599. rûn hebê di hîz da bihêle, pere hebin di kîs da bihêle
2600. rûnê ereba pir dibe, di xwe didin
2601. rûnê ji erdê berhev bûyî ye
2602. rûnî te pirbê di hîz da bihêle, perê te pirbin di kîs da bihêle
2603. rûvî sed çêrokî dizane, nod û neh li ser mirîşkane
2604. rûviyek ne çû qolekê, kaşanek bi xwe ve girêda
2605. rûyê reş, wê bi teniyê çi bikê
2606. sal wekî bawîşka tên û diçin
2607. salê carek mêranî, mehê carek mêvanî, rojê carek domanî
2608. salê du caran cejn dibin, di wan rojan de jî zikê sêwiyan dêşe
2609. salekê şivan e, deh salan heywan e

610. saqo li yaqo
611. saxo bi xwedê re, çirûko bi dinê re
612. se çiqas ji tere nas be, dar ji destê xwe nevêje
613. se direyin, hevdu dibînin
614. sê henek bi rastiyekê ne
615. sê tişt hene bi dilêş
616. sê tişt hene xwaş in bi sarî, mehîr, ar û karî
617. sê tiştan ji bîr mekin
618. sê wêne dost hene
619. se, seye hestiya dixwe hesabê paşeroja xwe dike
620. sed gazêt werîsî, esil heçik e
621. sed gotin bi gotinekê disekinin
622. sed mêr kerwanek, du jin bazirganek
623. sed tirr û tirrek li ba tirreka yeke
624. sed xeber bi xeberekê disekine
625. seg çiye û siya sêg çiye
626. seg rewa xwe zanê kerwan rê ya xwe zanê
627. seh direye kerwan dibihore
628. sênîka te ya şikestî çêtir e ji ya xwastî
629. ser qube ye, bin tirbe ye
630. serdan, salê carekê bi siltanî, mehê carekê bi mêvanî, rojê carekê bi dilmanî
631. serê bênamûsa cinetê nabîne
632. serê heft newalan newalek, serê heft pirsan pirsek dibirre
633. serê keçel di bin kum de başe
634. serê min bi şar e, çibikim dilê min bi jar e
635. serê navçiyan tê şikestin
636. serê ne êşe dismalê lê girêmede
637. serê neêşî, destmalê nedê
638. serê sing du çeq e, loma di axê de naçe
639. serî çawa çû, paşi jî dide dû
640. serî çiya yên bilind her mij û dûman e
641. serî çov di bin ebê re li dijminî xwe mîne
642. serî çû qûnê da dû
643. serî du berana di biroşekê de nayê kelandin
644. serî heft şora şorek dibirê
645. serî her mezin dibê, ecêba dibînê
646. serî hezar galgalî galgalek
647. serî hezar newalî newalek
648. serî ku hebin, kum gelek in
649. serî kûçka ne êşê, narin çawîrê naxun
650. serî mêr ne êşê, narê ser rêkan
2651. serî mêran çayê bi dûman e
2652. serî sax bêlgi naxwazê
2653. serî xwe di hefsarî boş re meke
2654. serî xwe mexe bin ebê xelkê
2655. serîk genim kefçîk şorbe ye
2656. serikê hêl û mêla xarzayê gerden kêla…
2657. serîkî çortan e, birkî mêvan e
2658. seriyê ku hate birîn nayê kirîn
2659. seriyê ku ne êşê, kundirek ji çêtir e
2660. seriyê reşo te çi dî
2661. seriyê xwe qot kirî li şera digerê
2662. seriyek çirtan, komek ewan
2663. seriyek ku deh serî jê nehesidin ne ti serî ye
2664. serpêhatî ji hekîmê luqman çêtir dizane
2665. serpiyê şamê ye, kî carekê bixwê, carek dî naxwê
2666. sêva çê para hurçê ye
2667. sêwî sitirîn, melek etirîn
2668. seyê bê tîmar qaha mala ye…
2669. seyê gurêx, di tuletiyê de jî gurêx e
2670. seyê har bela xwe dibîne
2671. seyê me termê miha me dixwe, li ber deriyê xelkê jî direye
2672. seyên birçî qûnên hev bîndikin
2673. sibê parî, nîvro heta karî, êvarê dixwî naxwî tu dizanî
2674. sifra merdan tim raxistî ye
2675. sifrê comerdan tim li meydanê ye
2676. silober bi gulê çikirî, gulê bi silober çikirî
2677. siltik hatin bûn siltan, pêlik danîn çûn asîman
2678. simêl-sorê mera hebin, kezî-sorê xelkê pirin
2679. sing ji ber mêkut diçe erdê
2680. sing tûj meke û mexe xwe
2681. singê sê çiq naçe erdê
2682. sîno sivik hîn gi li te neketiye şivik
2683. sîpe yî biçûk e, barî giran e
2684. sipiyek kulek şevê li nav heft ciyan digerê
2685. sîran nexwe, bîn ji te nayê
2686. sîrkut hilat, mîrkut dahat
2687. sirt bê ba nabin, geliyên kûr bê av nabin, û dildar bê yar nabin
2688. sîsalk dimînin dawiya pizana û sûc dikin stûyê şivana
2689. siwar hat peya çû

690. siwara dibe û peya dihêle (id rind dibe, ê xerab dihêle)
691. sîwarbûna kerê carekê eybeke peyabûn du eyb in
692. sîwarê hespê xelkê, her peya ye
693. sîwarî hespî xelkê, kengî be peya ye
694. soldirû pêxwasin, cildirû bê kirasin
695. solên koşkara tim çirrîne
696. sorik biskinê, gulover î rehet e
697. sûc topaçê berfê ye, kes nakê paşilê xwe
698. sûcliya zimanî xwe kin e
699. sûnd şûrê du dev e
700. sûndî kabciya netê ye
701. swarê kera ne ti swar e, jina bi mêr ne ti yar e
702. şabûn ji mirtiba nayê
703. şahidê rûvî terrî ya wî ye
704. şala çivîtkirî pirepir e, zik ji nêza re qurequr e
705. şand diziyê, lê da firiziyê (ton fîtkirinek e)
706. şansê te hebe, sêlê dernexûn dîne, nên bikê, wê bên
707. şansê te pîs bê, diranî te wê di kolkê da bişkê
708. şansê xwe di kûnê gur da ye
709. şeb û şekir, ji hev nasnekir
710. şekala xwe ramede nav qonderê xelkê
711. şekir ne xurdê gavana ye
712. şepilê kora li nav hijîra
713. şêr bi fena tê girtin
714. şêr bi lepê xwe mêr bi destê xwe
715. şêr di xew da be, berx qeral e
716. şêr kal dibin rovî bi gunkid wan dilîzin
717. şêr ko pîr dibin, dibin qeşmerê roviyan
718. şer xweş e li nav şovê, ne li nav bênderê
719. şerav (araqî) dan bizinê, çû çêy li gur gerî
720. şerê ku hate ber dêrî, li ser sêrî
721. şeref ji jiyanê mezintir e
722. şerî kûçka li ser sergoyî me ye
723. şerî wehşan di nav garisî me de dibe
724. şerî xwe di kevra dide
725. şêrîn şêrîn here malên dostan
726. şerm bike ji şermnekeran, bitirse ji bêtirsan
727. şêro, bi lepê xwe
728. şerr bi tivingê vala nabê
729. şerrê kûçkan li ser dêlan e
2730. şev çiqasî tarî be, lê ronayî li paşî yê ye
2731. şev hemû avisin
2732. şev kal bû rovî har bû
2733. şev reş, şûv reş, mî qemer berxa reş li ber gur li ser hev dikê der
2734. şev yek e, diz hezar in
2735. şevê reş ji êvarê de reş e
2736. şevid reş, şevêd mêran e
2737. şewat şewatê tînê
2738. şêwr heye, sinet e
2739. şêwrê çûka li ser garisî me ye
2740. şêx û feqî bi miriya dipirsin, kirîv bi şahiya dipirsin
2741. şikefta sed bizin herê yê, sed û yek jî ê herê yê
2742. şîn jî ya meye, şahî jî ya meye
2743. şîn şînê tîne, şahî şahiyê tîne
2744. şîr bi şekir xweş e
2745. şîrê kerê anca sîpê mezin dike
2746. şîrê kerê ji cehşa kerê re ye
2747. şîre li malê te hebê, mêş ê werin ji bexdadê
2748. şîreta bûk û xeswê ye
2749. şîrî kerê ne besê kuri yê ye
2750. şirra tehl, qawînên şêrîn jê nabin
2751. şirrê (tamar , lem ) tal ecûrî şêrîn nakevê yê
2752. şivan dilbike, di sola xwe de şîr didoşe
2753. şivanî xirap zanê pez li ku dayî gur
2754. şîvê me nîsk û bulxur e tev li hev e, taştî me jî nanî tisî carna vê ra dew e
2755. şivkê ter zû rast dibe
2756. şor ji devî mêra derdikeve
2757. şor jî hene, şorik jî hene
2758. şor ji kufta xwaştir in
2759. şor şora tînin der
2760. şora hêvarê ne ya me ra ye
2761. şora rast dendikek zihêr pê re ye
2762. şorbe zik dike torbe ( tûr )
2763. şorê mê dine kûnê şorê nêr
2764. şorê rast sê diram zêhêr tê dane
2765. şorêd ber ara, dikevin qulên dîwara
2766. şorêd pir bayê kur
2767. şorek rast pîşê sed şorî dibirê
2768. şorên çiya û pesara mînin ber ara
2769. şorên pîs ên xwedana ne
2770. şoreta kerê palasa wî ye

771. şorid êvara, nayên sira
772. şorkara ker firotine gura
773. şûjin bi fen tê qulkirin
774. şûjina xwe nabînê, derziya xelkê dibînê
775. şûjinê di ber serî xwe ra nabînê derziyê di ber serî xelkê ra dibînê
776. şûna ku dêya mera bigrî, bera diya xelkê bigrî
777. şûna şêra kundek kor
778. şûna şêra, mane roviyê şikêra
779. şûna şûr û tîran xweş dibe, lê ya qise yên nexweş xweş nabe
780. şûnê birînê qurşînê çê dibê, şûnê şorê xerab çê nabê
781. şûnê dêkê min digrî, bila dêkê xelkê bigrî
782. şûr di des te de be, bila rehma xwedê di dilê te de be
783. şûr mêrekî dikuje, ziman hezaran
784. şûr qinî xwe nabirê
785. şûr û mertalê jinan ziman e
786. şûrê kê tûj be, bila li çaqa min bikeve
787. şûrê kê tûj be, ew dinê dixwe
788. şûrî kê stûr e, ardî wan î hûr e
789. şûşa dil ku şikest nacebire
790. şuşt bi heri yê, rêxist bi diri yê
791. şûştin reng û rû ye, xwarin gend û gû ye
792. ta em hev nas bikin, emê umir xelas bikin
793. ta hirç rabûn semakirin heft merî bi birînkirin
794. ta mirov dêndar nebî zengîn nabî
795. tajî bi zorê narê awê
796. talana bi xelkê re dawet e
797. tamareka tehl û şêrîn di zimên de hene te tehl kir tehl dibe, û te şêrîn kir şêrîn dibe
798. tas hat û çengirî çi tije û çi vala
799. tasa li derve bimîne, seg dalêse
800. tasûmê ne çepê xwe hey e, ne rastayê xwe heye
801. tat li kerê girêdayî dixin, dibên ev bifiltê ji wayî girêdayî xerabtir e
802. tat xêli dibin, guhên wan sor dibin
803. tava sibehan pere neke, tava êvaran hîç pere nake
804. tê bazara xwe bikê ta xû di eniya te re çekê
805. te bi destê xwe kir, tê bi stûyê xwe jî bikşînê
2806. te bi ereba ra got merheba wê tev sola werin ser kurk û eba
2807. te bi findiqiyê li deriyê xelkê xist, xelk wê bi gurmistê li deriyê te xin
2808. te bi tiştikî nizanî, te mala xwe xera kir û mala me li ser danî
2809. te bi yekî ra got ezê qîzê xwe bi te dim, wê bêje pîs e
2810. te çêlkê xwe bi firê xistin
2811. te çi di tewkê da hişt
2812. te çi kir bi deriya, wê were bi seriya
2813. te çi kir ji te ra ma, tê her tiştî bikê
2814. te çi xist biroşê, tê li gor wî şîvê derînê
2815. te çi xist biroşê, tê wî derînî
2816. te çi xist kewarê, ew tê xwarê
2817. te ecele gûkir, tê du cara gûkê
2818. te fedî ne kir, çi dikî bike
2819. tê gênim bikirê, li êrd binêr; tê qîzê bixwazê, li dê binêr
2820. tê gênim bikirê, li êrd binêr; tê qîzê bixwazê, li dê binêr,tê avê vexwê li kaniyê binêre
2821. te got neyse pir dibirê
2822. te got tu zanê, xircir di aşa de nabê
2823. te guçilî melefê dî, mebê kefene
2824. te gura gura dûv hêşt
2825. te karek bi yekî ra kir, divê hûn çêlka bi hev re derxin
2826. te ker ajotin tê li tirr fisa tehmilkê
2827. te kûçkî xwe têr nekir, ê herê ber qapî xelkê
2828. te lêxist, pehnê kurtanciya lêxe
2829. te li ku xwar, ew der ji te ra dibe war
2830. te nanê kê xwar, tu wê defa wî lêxê
2831. te qenciyek kir, bibe serî
2832. te qurbanek kir gereke tu jê bi heft malan dê
2833. te rindî kir ji te ra ye, te xirapî kir ji te ra ye
2834. te rindî xwast tê rindiyê bibînê tê xirapî xwast tê xirapiyê bibînê
2835. tê rokê rast gunik reşekî werê
2836. te rû da sêwiya, mewîja dixwazin
2837. te tim zînî li kêrgiyê kirî
2838. te xêrek kir, bi serî bike
2839. te xwe da nav avê, çi li kabê çi li navê
2840. tehtê te lê rîne, hîn baranê neşuştine
2841. tehtên wî lê rîne heft sala baran naşû
2842. temaşe ji mewîja xweştire

843. temîz e kakil ket kûz e
844. temûz dibêje, tebax dirêj e
845. tene bû firîg, mele bû şirîg
846. tene ji kaya kevn dernakevê
847. tenya binê beroşê ye
848. têr (teyr) hene tê goşt pêdê têr hene tê goşt buxwê
849. têr bi halê birçî, sax bi halê nexwaş nizane
850. têr tev dujminê kêwin, kew jî dujminê miletî xwe ye
851. ter û hişk bi hev de dişewitin
852. têrekbû li destê te nîşt lê te pê nizanî
853. têrxwarin tune, danîn edet e
854. teşiya mûşê çiqasî birêsî ji hev dikşê
855. têt ( tat ) têr xwar ê hiltirînê xewê
856. tevdan ji helîsê re başe
857. tevir doxê xwe ( destikîxwe ) qot nake
858. tevnê bike, xeca min; buha bibe, keça min
859. texmîn rêbir e, aqil hakim e
860. têxt ji mîx re got
861. textikî ser avê ye
862. teyr bi çengan difirin, mêr bi mêran dixwirin
863. têyr dijminê hemo kewa ye, kew bi xwe dujminê serê xwe ye
864. teyr laşe xwarbê, wê nikil xwarbê
865. teyr li berata digere
866. teyr rinde bi refî xwe re
867. ti çiya ko rê vê nekevin nînin
868. ti dar serî xwe gêştine ezmana tineni
869. ti dar tineye ko ba lê nekeve
870. ti gul bê strî tinene
871. ti kes vê qisûr tine ye
872. ti nema ye ku pêşiyan negotî
873. ti serî vê derd tinene
874. ticarê kovî ne karê dike ne zirarê dike
875. tifaqa mûriyan çiya dixeşibîne
876. tifka sayî, şerm bike ji xweyî
877. tim girî ne ji hiznê (şewatê )ye, ken ne ji kêfê ye
878. tim kirasê hesûdan kin e
879. tim kufte di gêlî re tolnabin
880. tim lêmişt na yê û qil û qirşa nîne
881. tim lêmişt nayê û pûş nayne
882. timahî tim kêmahiye
883. tinebê, camêrî hesan e
884. tinebûn kerasekî çetin e
2885. tinedîtiyan ti nedîtin, dema dîtin, bi xwe de rîtin
2886. tîntore, e bi ccarox tu bi gore
2887. tirbê nêzmiriya tinene
2888. tirbê xerîba tim li ûc e
2889. tîrê ciyê xwe dî
2890. tîrê davê kevên vedişêrê
2891. tirî bavê êlê ye, zêtûn diya feqîra ye
2892. tirî li tirî dinêre reş dibe
2893. tirr bi dîna dewat in
2894. tirr li hemama derew li xerîbiyê
2895. tirr têde bûne fis
2896. tirra meke, te kir jî mila du camêr bibên, li serî vî
2897. tirrê kûnê xwe meke kûnê hevala
2898. tirs berê mirinê nagirê
2899. tirs dijminê aqil e
2900. tirs hebe erd giran dibe
2901. tirs mergê rovî ye
2902. tirsa gur ji baranê hebûya, wê ji xwe re kulavek çêkira
2903. tiştê dila, nayê mila
2904. tiştê kevnê wî tunebe, teze yê wî jî tuneye
2905. tiştê ne çê, para keçê
2906. tiştekî te winda bû heft caran malê xwe seke paşê cînara pirske,
2907. tiştî bi qelem bê nivîsandin, bi bivir nayê şikandin
2908. tiştî çû mekefe dû
2909. tiştî giranbiha î erzan e
2910. tiştî tu dixwazê bi des te neket, tiştî bi des te ket bernede
2911. tixobê xortan tune ye
2912. tor tor digerê, karikî xwe nakê
2913. toraqa îro ji rûnê sibê çêtir e
2914. tovê ku dijmin bireşînin, dê stiriyan şîn bike
2915. tovê xwê ye, pisê hêstirê ye
2916. tu bi rêkekê de çû bila çîk ji ber lingid te bifirin
2917. tu bi tivingê ne mir, tê bi vî hîmî jî nemirî
2918. tu bi yekî ra bi rêyekê de çû, bi xwe di rê ra meşî û tu jî da aliyê rê, carek din vê re med-mestîn
2919. tu bi yekî re bû heval gereke hûn çêlka bi hev re derxin
2920. tu bixazê kerek te hebê bixwaz du ker cîrana hebin

921. tu bû heval yekî û hûn ji hevdu xeyidîn mila sûcê wî bê
922. tu bû mîr, xwedê meke bîr
923. tu cehnimê ( dojeh ) nebînê cinet ( bihuşt ) bi te xwaş nabê
924. tu çi biçînî, tê wî hilînî
925. tu çi bikî ji xwe re dikî
926. tu çi bixî kewarê, wê ew were xwarê
927. tu çi têxî biroşê, tê wê bixwî
928. tu çiqas bilind bifirî, tê weqas nizim bikevî
929. tu çû ku tê şûrî wir biikşînê
930. tu çû malên dosta, bi ber taqan mekeve ; dostid te hebin, bi ber berîkan mekeve
931. tu çûyî bajarê yekçava, divê tu jî çavek xwe bigrî
932. tu derê ji xelkê ra goşt dibrêjê û tu tê ji min re wê çêrokê dibêjê
933. tu dibê qey erd veqelişî û daqirtand
934. tu dibê qey heft kirine qulekê
935. tu dibê qey ji gundê bêlê hatiye meşkekê
936. tu dibê qey xwîn ji bin kerkê berdane (sist û gêj e)
937. tu dibî hevalê merivekî, bila ew merî di ser te re be
938. tu dibî nankir, genim bikire, perçe dikirî, çox bistîne
939. tu dikê dîna bi dengkirin bidê, dîndoq bi des de
940. tu dikê golkî xwedê biçêrînê
941. tu dikê keça xwe nedê yekî, qelen biha bike
942. tu dixwazî li serî min ho bibî berberiyê
943. tu dojehê nebînî, behîşt bi te xweş nabe
944. tu ê ko mera te ji nexwaşa ra bişînê zebeşa ye
945. tu fedî nekî, çi hebe tê bikî
946. tu girêka xwe bi destê xwe venekî, kes ji te re venakî
947. tu gul bî gula cûrî, bibişkuvê lîlka jorî ta vebê temenê min bihûrî
948. tu gul bî, ez te di ber yaqê re nakim
949. tu heft mehe havîn dikê qereqiş
950. tu her çi bêjî, li bejna heyran tê
951. tu hijda bazdî tê zû biweste
952. tu ji çi bitirsî, wê werê serî te
953. tu ji hêştir guhekî didê mera
954. tu ji kê hez dikî, tê loma lê bikî
2955. tu ji meriyê pir sofî (olperest) bitirse
2956. tu kê cêw bikirî, tê li kenarê binêrê
2957. tu kê tiştekî buxê, û bi des te de bipekê çavê hina têda ye
2958. tu kerî nêr di hêlika ra nas dikî
2959. tu kesî ji koka darê tune ye
2960. tu kevir bavêjê çiravê, wê peşk bêne te
2961. tu mê bî jî tu kê bizê, tu nêr bî jî tu kê bizê
2962. tu ne miste, û ne jî gurmiste
2963. tu newêrî bêjiyê, dûyî êgir tê te
2964. tu pêri (parî ) necûne narê xwar
2965. tu sêfîl ket, cêhê biçîne û mirîşka xwedîke
2966. tu sibê radibî, bêje, xwedê, pêşiyê bide cîranê min
2967. tu şêx bî, rojid înê pir in
2968. tu şîrî şêr di eyarî çêlkê şêr da bixwazê ezê ji tera wînim
2969. tu teneke di nav ava zêr de jî bikî dîsa tneke ye
2970. tu textikî ser avê ye, kes nizanê rêyê te di kura ye
2971. tu tim li kerî ketî digerê
2972. tu were dewê min bikêle, ez jî herim dewê lawê mîr bikêlim
2973. tu werê kuştin û tu netê şuştin
2974. tu xwe bi kuda biftilînê, kûnê te li paş te dimînê
2975. tu zanê xaço mirî, lê tu nizanê sêrojka wî li ku didin
2976. tûrî virekan tim bi qul e
2977. tûrkî derewîna tim qule
2978. tûrkî xwe li ba kê bû ye dawmeşîn
2979. ûcaqî kor ne di tinebûnê ewlada tenê da kor e, di hebûnê ewladî tenbel da jî kor e
2980. umrî kûçkî har çêl ro ye
2981. vê xemê bihêle wê demê
2982. vê zivistanê gur ji qulê xwe dernakevê
2983. vexwe dew, têkev xew
2984. vî duxum têr nabim, wî duxum qût nakim
2985. vir di dûyî miriyan ra dibin
2986. vir mirdar in
2987. virrek carekê taştiyê dixun
2988. vitek bi ciwanî, vitek bi pîrî
2989. viyana dilan bi dayîna destan diyar e
2990. war, warê hêşîn, bext, bextê pêşîn
2991. warê xelkê ji mirov re nabe war
2992. wek ba tê bêderê li bake

993. wek mirîşkê hêk vê re li ciyekî nasekinê
994. wek nanê ser sêlê ye
995. wek sêwyê eba bavê xwe li xwekirî
996. wekî du dil bibin tevayî, wê vî çiyayî hildin bibin ser wî çiyayî
997. wekî ku ez ciwan bûm, bi tîr û kevan bûm, gava ku ez pîr bûm notirvanê şikeva hevîr bûm
998. welat xweşe, bi welatiyan
999. werin dê û bava, berî li zaroya ye, zaro berî li çiya ye
000. werîsê derewan kine
001. wetaq bi obê ma, kevçê bi kodê ma
002. wexta giya bû, kes ne xiya bû, bû firîk, hemo û heso bûn şirîk
003. wexta heye mêvanî, wexta tine golikvanî
004. wexta kar rû dizîvirîn e, wexta şîvê kevçî tîne
005. wexta nêçîra min tê, gûyê tajiyê min tê
006. wî tûrê xweş e li serê wî kerî
007. xal xelk e, ap milk e
008. xalan xwarzî rakirin, apan birazî winda kirin
009. xaltiya donê, ji ser ve pakê ji bin ve çonê
010. xan nabe bê mêvan
011. xana bê mêvan ehremen lê civan
012. xar rûne doxri denke
013. xarzî li xalan tên
014. xasî dibêje qîza min ez ji te re dibêjêm bûkê, tu bibhîse
015. xatûn, me tu li ser (jor) dîtî, û li bin (jêr) jî dîtî
016. xebat şêr e, dest bavêjî dibe rovî
017. xeber ker e, bajo here
018. xeber ket nav sî û sê (du) diranan, wê bikeve nava sî û sê bajaran
019. xeber ne karê mêra ne
020. xebera xweş bide dujminê xwe, pariyê xweş bide hevalê xwe
021. xeberê mirinê, zû beladibê lidinê
022. xelk dihere tiştan tîne, kor-elî dihere mişkan tîne
023. xelk hejîra dixwen, em kerka dicûn in
024. xelk li baniya wek hev in
025. xelk li dûberana rast tên, em li fisgura rast tên
026. xelk mal û dewletê çêdike, ez û andro kolozê xwe tûj dikin
3027. xelk mera bi serê xwe nahêle
3028. xelkî bi merî ye, mişkî bi serî ye
3029. xema gure ؟ deve biha ye
3030. xema mexe xem xirap in, gula biçin sûsin ê rabin
3031. xemla mala kejî û gulîn e
3032. xemla malan stêr û qulîn in
3033. xêr û gunehên te li stoyê te ye
3034. xêr û neheq xwe li ber baranê şil meke
3035. xêra bike û bi avê de berde
3036. xêra kîrê me, bû mîrê me
3037. xerapa çav li hevin
3038. xetê xwar di gayî pîr da ye
3039. xew nema li biçûkan, fedî nema li bûkan
3040. xew û kew herdu bi hevra nabin
3041. xew û mirin yek in
3042. xewa bav kuştiyan tê, xewa zikbirçiya nê
3043. xewa kuştiya tê, xewa birçiya nayê
3044. xewa sibehê xewa kûçika ye
3045. xeysetê ga xwedî dizane
3046. xezal çiqas bezaye, ji bilî rizqê xwe naxwe
3047. xezal çiqasî a beza ye, bêtirî rizqî xwe ranake
3048. xirapiyê her kes dikarê bike, qencî dijwar e
3049. xîret zêr e, ji bilî namûsa vêre
3050. xizanî ne gunehkarî ye
3051. xizanî zenga mêran e
3052. xizanî, qedrê peran tênî
3053. xoce dibêjin, me çi kir, mekin lê me çi got, bigrin
3054. xoce ê birinê ne, ne yê danê ne
3055. xort xortaniya xwe dike, qels doza çi dike
3056. xu (xwêdan) di bin cên de yî, xû di bin eyêr de yî
3057. xû ya şîrî çû pîrî
3058. xudanê lezê her poşman e
3059. xudê nanî şil nexê zikî her kesekî
3060. xudê yê gotî dê te keme mîr belê min neke ji bîr, eger bike ji bîr dê te keme êxsîr
3061. xudiyê fisê bi xwe dihesê
3062. xulî li serî î mirî ye
3063. xult axê dikolê bi nav çavid xwe dikê
3064. xult jî li bîrî çava ye
3065. xumxuma piyê hespê nêr, ji bin milê ga yê cot tê
3066. xûn bi xûnê nayê şuştin

067. xûn xûnê meriya ye laşe laşê kûçka ye
068. xursîne ne dixwin ne didin kesîne xwediyê xiyarê çelmsîne
069. xur-xurê ewran nîşana baranê ye
070. xuya malê jê nayê xwestin
071. xwandin çala bi derziyê ye
072. xwar rûne lê rast biaxef
073. xwarbûn xerabûn e
074. xwarina bi heval xweş tê xwarin
075. xwarina xwe bi gura ra ye, meşa xwe bi şivana ra ye
076. xwastina keçan jî ne şerm e, nedan jî ne şerm e
077. xwastinê qîza jî ne eybe û nedan jî ne eybe
078. xwe hêvşand (xwe ragirt ), xwe hêvşand, hêvarî henê xwe kişand
079. xwe ji strî xeyara diparêzê
080. xwe kiriye şorba nexwaşaa
081. xwe li ber êgir germ dikin û xaliya xwe jî davêne ser rêyê me
082. xwe li heft avaxê qolanê piştê şil nabê
083. xwe li tîrî kêm dîmene
084. xwe meke benîşt, û mekefe devî xelkê
085. xwe meke taldê dîwarê derizî
086. xwe nede ser berê bê bin, û xwe nede pêşiya mêrê dem demî
087. xwedanê çêlekê ji xwedanê kerê şîr dixwazê
088. xwedanî namûsê kerr e û kor e
089. xwedê bidê jî qûlî ne rind nahêle
090. xwedê carina dikê mû, lê naqetînê zû
091. xwedê carina li xet û nîvê dide meriyan
092. xwedê fersendê enbarê cihê nekê keran
093. xwedê fersendê kuspê nekê tata
094. xwedê fersendê mêrê çê nede dest mêrê xerab
095. xwedê fersendê şêran neke roviyan
096. xwedê gotî ,ez ji qûlê xwe razî me ji ber her kes bi xwe razîye
097. xwedê gotî, ya ez ba me, ya jî ez di bê de me
098. xwedê kesî hoyî pariyid şil nekê
099. xwedê kevrekî li mera dixîne û heftan jî di ser mera re digre
100. xwedê kûsî dibînê û di wî qaliqîda datînê
3101. xwedê li wê dinê wê heqê bizna kol ji ya bi qoç bistîne
3102. xwedê noka dide kalên vê diran
3103. xwedê rû dibîne û sîlê lê dixîne
3104. xwedê şaşkê dide wî, nizane girêde
3105. xwedê umrî li daha dayî li naha nabê
3106. xwedê xwedê ye, ne mêrê medê ye, bavê mera dikuje, dêya mera jî dide xelkê
3107. xwedê yekê bi serî mera dike û hefta jî di ser mera re digre
3108. xwedî mal bi malekê ye, bêmal bi hezar mali ye
3109. xwedi yê mal heye, malê bê xwedî tune ye
3110. xwedi yê pendê dikeve kendê
3111. xwedi yê xêra rebenê dêra
3112. xwediyê xêran dibe rebenê li ber dêran
3113. xwelî li wî be, ew ê mirovên xwe bide bi xelkê
3114. xwelî li wî serî ewê ga da bi kerî
3115. xwelî li wî serî ku hefit serî jê ne êşin
3116. xweşî bê tehlî nîne, qonax bê hostan ava nabî
3117. xwîn xwinê meriya, laşe laşê kûçka
3118. ya dil, mila di dil de bê
3119. ya mêra, lêhatin e
3120. ya narim êş, ya ezê aşvanî bikujim
3121. ya xwe di zikî gur da nahêle
3122. ya ziman dibirre şûr jî nabirre
3123. yahûdî sêfîl dibe defterê kevin vedike
3124. yan arvanê xwe li êşke, yan jî ji êş barke
3125. yan bi cîran be, yan bi heval be
3126. yanbasi li gayî cot nabê, lê qûl dikê
3127. yarê di ya mi yek ba minê bi dendikê bihîva xwedîkira
3128. yê ku li du riyan dinêre şaş dibe
3129. yê ne ji hinava, nayê pêş çava
3130. yê nû hat, mirov li yê çûyî digere
3131. yê nû tim yê baştir nin e
3132. yê pisyarkerbe dawê zanabî
3133. yê tiştekî nizanibe tiştekî ji bîr nake
3134. yê xêrê naçin dêrê
3135. yek heye bi sedî, sed heye ne bi yekî
3136. yek îdare nake ( têrê nake ) didu li hev nakin
3137. yek mir, yek mirdos, yek filitî nate des
3138. yek ne di govendê da bê, sema pê hêsan e
3139. yek niç (na), du niç, ê dinê serî li kuç

140. yek ta nabe, du ta tê re nabe
141. yekî berazî û yekî karazî ji hev ra bûn xal û xarzî
142. yekî bi te re got
143. yekî du ga hebûn, yek nediçû axirê, yek ji axirê dernediket
144. yekî got
145. yekî ji sergînekî hezkir heft sala bi xwe re gerand li dawiyê av kir ser û vexwar
146. yekî jinê xwe ji dest dêna difroşe, yek hat, go
147. yekî ko nerindiyek bi te kir, tu rindiyan pê bike
148. yekî li jina xwe xist, go
149. yekî mêr pêveda, ji gera werîsa ditisiya
150. yekî nalek dî got
151. yekî rindîk bi te kir, bi tobekirin mede
152. zanibê çi bêjê
153. zanîna bi çûkî kolîna li berî ye
154. zarî koşkara tim a pêxasin
155. zaro bi lîstikê gir dibin
156. zaro li zorê ke, bûkê li kerê ke
157. zarok di lorik da, bûkê di sorik da
158. zarok duxin ta çav dibînin, kûçik duxin ta dûv dilivînin
159. zarok guleyên zêrî ne
160. zarok kezeba dê û bava ne
161. zarok kulîlkên malan e
162. zarok li ser mila dê mezin dibin
163. zarok perdên sipî ne, nexşên xweş lê dîne
164. zarok ta çav dibînin, kûçik ta dûv dilivînin
165. zarok zaroke, ha firiye ha ziriye
166. zarokê çê bi dê û bavên xwe naşêwire
167. zarokî baş dibê kî hevalê min e, nabê ez hevalê kê me
168. zaroyê bê dê şîva bê xwê
169. zava kerê xezûran in
170. zave tim kûçkên xezûrane
171. zebeş ji teyîkî xwe direvê
172. zengînê heft perspana ye
173. zengîno bimbarek, fiqaro te ji ku anî ye
174. zengîno, te bi çi kirî; xizano, te ji ku anî
175. zêr biçûk e, biha giran e
176. zêr bide zêrkeran
177. zêr çiqasî çûçik e weqasî biha ye
178. zêr qilêra destî mêra ye
3179. zêr zanê, zor zanê, devî tivingê mor zanê
3180. zerik çingiya, çi rast çi derew
3181. zerik ket, neşkî lê deng da
3182. zerka vala çingînî jê tê
3183. zerka xwe ya dagirtî, li zerka xelkê ya vala nexe
3184. zêrker bi qedrê zêran zanê
3185. zêt ta heft salan dinê
3186. zêtê nekî çirê, çira vênakevê
3187. zeviya ji zeviya zêde, heft cara gîsnê xwe lêde, paşê tovê xwe têde
3188. zik baxçe ye, her tişt tê heye
3189. zik bîstane
3190. zik ne êşe, dev nabêje
3191. zikbirçî têr dibin, belê çavbirçî têr nabin
3192. zik-birsî têr dibî, malbirsî têr nabî
3193. zikê xwe ho meke hemo dana, heye ko bi des te nekevê carina
3194. zikî mera ne sifre ye, ko mera ji her kesî ra raxê
3195. zikî têr qurqur jê nayê
3196. zilam darê şikestiye
3197. zilam serkar e, jin binkar e
3198. zilamên pîs timî fena li yê baş dikin
3199. ziman bê hesti ye, digere
3200. ziman bê hesti ye, hefsar di des xwediya ye
3201. ziman go
3202. ziman him dost e, him dujmin e
3203. ziman him yar e, him neyar e
3204. ziman kilîtê dilan e
3205. ziman li zimên namînê
3206. zimanê dirêj, bela sêrî ye
3207. zimanê te rihet be, serê te vehesi ye
3208. zimanê te toqmaqê te ye
3209. zimanî sorik biskinê , ciyî bilind ê mera ye
3210. zimanî xwe bibirr, ciyî xwe bikirr
3211. zimano riheto, seriyo firqeto
3212. zîniqê navê xwe derneket, çû bi serê kaniyê da mîst
3213. zirara elkê, kara xelkê
3214. zirarê dûvmeqeskê, ji yemenê pirske
3215. zirarê megîne kesa ji bo negihê pisa
3216. zivistan hat kerasê sêfîla dirrî
3217. zîwana gundî mera ji genimê xelkê çêtire

218. zor di derî re bikeve hundir, qanûn di kulekê re derdikeve
3219. zor ji zêr xurtir e

Ji "https://ku.wiktionary.org/w/index.php?title=Wîkîferheng:Kopîkirî/Pend_û_Peng,_Bîlal_Hesen&oldid=4739369" hatiye standin.

**Ev rûpel cara dawî 17 çiriya pêşîn 2020, saet li 09:27an de hatiye guhartin.**

Nivîsar di bin lîsansa Creative Commons Attribution-ShareAlike License de derbasdar e; heke tiştên din werin xwestin dikarin lê bên zêdekirin. Ji bo hûragahiyan li Mercên Bikaranînê binêre.